


Nirxandina derdorên kurd li ser mutalaya Doza Sedçalê:

Helwesta dozgeran siyasî ye



Tarik Ziya Ekinci:

Hîn li Tirkiyeyê piraniya hemwelatîyan ne xwedî mafên 'qûlan' in jî. Kurd bi tenê di warê bikaranîna reyan, çûyina leşkeriyê û dayina bacê de wezîfedar in.

A. Zeki Okçuoğlu:

Me li hemberî dewletê tu sûc nekiriye. Wan em mecbûrî çekê kirine. Ji wan yek miriye, ji me deh kes mirine. Divê Öcalan banga yekîtiya kurdan jî bike.

Ali Özcan (HADEP):

Dewlet ji bo çareseriyê nikare gaveke jixwebawer bavêje. Öcalan gavên jixwebawer avêtine û di encamê de çi dibe bila bibe, wê çareserî pêk were.

Yavuz Koçoğlu (DBP):

Bi kampanyayên nîjadperestî, dixwazin kêşeyê bêhtir bincil bikin. Lê, berê xwe nadin kêşeya bingehîn.
(Nûçe:R.3)

Bi çavê bapîrê me,

■ Dewleta tirk van salan qesta Heskîfê dike, ku yek ji kevnaretirîn şûnewarên cîhanê ye. Dê ji bo bendaveke 50 salî, ev şûnewara bêhempa di bin avê de bimîne. Li dijî vê yekê, gelek komên tirkiyeyî û cîhanî dest bi rizgarkirina çalakîyên Heskîfê kir. Lê balkêş e, her çend hin xebatên kurdistanîyan hebin jî, herî kêr dengê wan derdikeve.
(Nûçe-Lêkolîn:R.8-9)



Heskîf

Revandineke Zindî:
Fehmi Tosun

DAYÊ! BAVÊ MIN
DIREVÎNIN...

✓ Fehmi Tosun, berî vê bi 5 salan li ber çavên zarok û şênîyê taxa xwe hate revandin. Hevala wî Hanım Tosun ev 5 sal in li her derê doza hevalê xwe dike.

(Şehîd:R.6)

Di eîhana
global de rola

NATO'yê



Rêzenivîs

1

Ji ber peydakirina
nasnameyeke nû;

NATO KETE
QEYRANA STRATEJÎK

(Dosya:R.4)

Şerê li Keşmîrê gur bû


HÎNDISTAN Û PAKÎSTAN
GEFAN LI HEV DIXWIN

✓ Kêşeya Keşmîrê, ku erdê wê di navbera Pakîstan û Hîndistanê de hatiye parçekirin, ji nîveka gulana 1999'an vir de bûye sedema pevçûneke nû.

Li gorî agahiyên ajansên nûçeyan, di mehên zivistanê yên bi berf û pûk de, nêzî 400 şervanên misilman, bi çekên giran, li cihên bilind û stratejîk ên li ser Xeta Kontrolê ya di navbera Pakîstan û Hîndistanê de bi cih bûne.

(Dûmahîk:R.11)

Azadiya WELAT



E-Mail: s.berbang@usa.net

SAMI TAN

Dijminên bîrdoza me û Öcalan

Gotineke pêşiyên kurdan heye, dibêjin: "Dijminê koka me ne", mirov dikare vê gotinê wiha li vê rewşê bîne: Ew dijminê bîrdoza me ne.

Serokê Giştî yê PKK'ê û Serokê Rûmetê yê KNK'ê Abdullah Öcalan piştî ku Doza Sedsalê taloqî 23'yê pûşperê bû, bi riya parêzerên xwe peyman ji gelê kurd û tirk re dişine. Ew peyman bi piranî di çapemeniya kurd de cih digirin. Çapemeniya tirk, hinek weşan û ajansên navneteweyî jî hin caran van peyman berevajî dikin û diweşînin.

Kesên ku peyamên Öcalan ên li dadgehê bi awayekî erênî jî dinirxînin, yên ku bi awayekî neyinî jî dinirxînin, didin zanîn ku Öcalan gelek kes şaşwaz hiştine. Tê gotin ku civaka tirk bi destkariya serdest û çapemeniya tirk di serê xwe de di kesayetiya Öcalan de cinawirek nîgar kiribû, lê li pêşberî xwe mirovekî biliyan û dilovan dît. Li hemberî vê yekê gelekî şaşwaz ma û êdî nizane gira xwe çawa bide der. Li aliyê din hinek çepgirên tirk û kurd jî hêvî dikir ku Öcalan parastineke tûj bike û her tiştî li

nava guhê hev bixe. Lê ev yek jî pêk nehat, lewre ew jî şaşwaz man. Heta gelek nûçegihanên çapemeniya cîhanê jî ji ber heman îmajê nîgarkirî şaşwaz man.

Niha Öcalan di peyamên xwe de dixwaze raya giştî ya kurd û tirk li ser armanca xwe baş agahdar bike. Lê mixabin dîsa leqayî helwesta neyinî ya çapemeniya tirk tê. Lewre jî peyamên wî tene berevajîkirin. Ev yek jî careke din nîşan dide ku helwesta çapemeniya tirk helwesteke politîk e û ne ji ber nezaniyê ye. Belkî heman tişt jî bo çapemeniya welatên ku di nava komployê de cih girtine jî derbas dibe. Yanî, mirov dikare bibêje ku di vî warî de jî hêzên dagirker û împeryalist lihevkiirî ne. Heta niha wêneyê 'cinawir'êki dihat nîgarkirin, niha jî wêneyê 'tirsonek'êki tê nîgarkirin. Armanca jî hev xistin û parçekirina yekîtiya gelê kurd e. Gotineke pêşiyên kurdan heye, dibêjin: "Dijminê koka me ne", mirov dikare vê gotinê wiha li vê

rewşê bîne: "Ew dijminê bîrdoza me ne." Li hemberî vê helwesta politîk, divê mirov jî bi awayekî politîk tevbigere. Divê armanca me ew be ku em hêviya împeryalist û dagirkeran di qirika wan de bihêlin. Digel vê yekê divê em gelên bindest û dostên xwe jî hişyar bikin. Ji mêj ve em dibêjin ku împeryalist dixwazin di kesayetiya Öcalan de hêvî û daxwazên gelan ji holê rakin, lê mixabin hê jî hinek dostên me vê yekê fêm nakin. Çîrok û çîrçirokên xwe yên klasîk dibêjin, ev helwest jî me li ser rengê dostaniya wan dide fikirandin.

Li aliyê din kurdên me yên ku çengek xwêya wan di vê xwarinê de nîn e jî dîsa bi karê xwe yê her car radibûn û dixwazin çend kevîran bavêjin nava avê, ku hinekî şêlo bibe da ku karibin ji xwe re çend masiyên xêşim bigirin. Peyamên Öcalan ên dawîn jî bo dostên jidil û gelên bindest in, lewre jî divê teqez bîn xwendin.

Komploya mezin û şerê azadiyê

Ferhengok

- adan: bijûn, bi bereket
- asêgeh: kale, hisar
- bahor: meltem
- baranên çil esrîn: kirk ikindi yağmurları
- bêhempa: yekta
- berate: leş
- bişkiwîn: filizlenme
- cankuçik: kesê ku li ber canê xwe naqeve
- çêjandin: tamkirin
- daxbar: xembar
- derben: askî
- dîlse: dilkoçer (şîpsevdi)
- dirinde: hov, wehş
- dozîn: güdü
- erk: röl, dewr
- fişargo: gotinên eletewş ên tagirtinê, pesta gotin (sayıklama)
- gobilîn: esinti
- hilbezin: qevaztin
- kapan: kolanên teng
- kelepor: jêma, miras
- lêrahatîn: bağışıklık
- kazanma
- masûlke: kas
- miçûlgevan: lades tutan
- par: vücudun arka tarafı
- pêr: vücudun ön tarafı
- pesta gotin: sayıklama
- ravekin: izahkirin
- rêje: oran
- rikdar: kindar
- sekan: kayık küreği
- serjimar: nifûs
- serperî: deniz kızı
- serperîştî: rêveberî
- silûçk: tûma gû ya biçûk
- sofin/e: zeviya kulilkan
- takekes: ferd
- têkçûn: yenilgi, dağılma
- tiliya babelîçk: yüzük parmağı
- tiliya qilîçk: serçe parmağı
- wêjekar: edebiyatçı
- welê: wisa, wilo
- xetere: talûke
- xunivîn: çiselemek
- zertav: şevçeq

ŞEMSEDİN TEKİN

Tirkiye bi erdnîgariya xwe ji bo împeryalizmê cihekî gelekî stratejîk e. Împeryalizm tu caran naxwaze Tirkiye ji dîst derkeve. Lewre têkçûna KT'ê têkçûna împeryalizmê ye. Ji ber ku li ser Rojhilata Navîn daxwazên wan yek in, wekî goşt û neynûkê ne. Dewletên împeryalist jî bo berjewendiyên xwe yên aborî, leşkerî û siyasî KT'ê tim li ser piyan dihêlin; dewleta tirk wekî destik bi kar tînin. Hemû alem tê gihîştîye ku ne bi alîkariya împeryalistan be li hemberî Teverga Azadiyê KT ne gengaz e ku xwe li ser piyan bigire.

Belkî tiştê ku derdikeve pêş, şerê PKK'ê û KT'ê ye. Lê di rastiyê de şerê ku PKK dide meşandin ne tenê li hemberî dewleta tirk e, her wiha şerê PKK'ê û NATO'yê ye. Şerê du sisteman e. Mînakên vî pir in û ev yek hatîye îspatkirin. Di domkirina vî şerî de sedema bîngêhîn împeryalizm û siyonizm e. Ji ber ku bi hemû hêz û teknîka xwe alîkariyê dide KT'ê. Ev jî ne bes e bi awayekî fiilî jî tevî vî şerî bûye. NATO'yê PKK jî xwe re kiriye hedef. Ji bo wê pêwîst dibîne ku PKK'ê xilas bike.

Komploya ku ji 9'ê kewçêrê dest pe kir û 15'ê reşemiyê kete merhaleyeke nû hê jî didome. Dewletên împeryalist û hevkarên wan hîn jî hemû hêz û teknîka xwe ya komployî bi kar tînin. Sedem çî ye? Çima ewqasî bi ser PKK'ê û Serokê Neteweyî de diçin?

Împeryalizmê digot: "Me sosyalizm ji holê

rakir, li cîhanê sosyalizm nema; em bi ser ketin. Belê, împeryalizmê "sosyalizma Sovyetistanê" hilweşand, "bi ser ket." Împeryalizm di vir de di şaşiyê de ye, xwe dixapîne. Çimkî sosyalizm bi awayekî zanistî li Kurdistanê didome. Kurdistan keleha sosyalizma zanistî ye, berxwedana dawîn didome. Serok Apo şoreşgerê dawîya sedsala 20'an e.

Împeryalizmê got, divê rê li ber vê rapêrînê bê girtin. Ji bo vê kete nav hewldanê. Împeryalizm, bi salan e bi hemû hêza xwe ya siyasî, tek-

west gelê kurd û tevgera wî ku baweriya xwe bi Serok dianî û ew bo xwe wekî sitar didît hêvî-kestî bike.

Komploya li ser vî esasî pêk hat. Lê her çiqas Serok di destê wan de be jî ev komploya li gorî daxwaza wan neçû serî. Gel jî berê zêdetir partî û serokatiya xwe ve hate girêdan. Li her çar parçeyên Kurdistanê ruhê yekîtiya neteweyî pêk hat û li çarmedora cîhanê kurd rabûn ser piyan, li hemberî komployê wan nerazîbûna xwe anî zimên û cîhan bi berxwedana xwe hejand.

KT'ê li dijî kurdan û PKK'ê her rêbaz ceriband. Lê, bi ser neket û her roja ku diçe rûyê yê wê gemar eşkere dibe.

Di politikaya KT'ê de ji bilî daxwaza fetisandina şoreşa Kurdistanê tiştêk nîn e. Dewletê bi dek û sextekariyê DSP û MHP derxist pêş. Çimkî partiyên din giştî li dijî PKK'ê bi kar anîn. Lê, yek jî bi ser neket; giştî têk çûn. Yên ku bi awayekî rasterast nehatibûn ceribandin DSP û MHP bûn. Dê wan jî hetanî dawiyê bi kar bîne.

Armanca wan ew e ku komployê bibin serî. Îro her çiqas Serokatî dîl be jî gelê kurd di serkêşiya Partiyê de têkoşîna xwe didomîne. Hilbijartina dawîn jî ev yek çespanî. HADEP li Kurdistanê bû partiya yekemîn.

Belê, Partî bi taktîkên nû û mezin şerê rizgariyê dimeşîne. Gel di riya Partiyê de ye. Wê komployê veguhezîne mirina împeryalizmê û Komara Tirk.

Serok her çiqas di destê wan de be jî ev komploya li gorî daxwaza wan neçû serî. Gel jî berê zêdetir bi partî û Serokatiya xwe ve hate girêdan. Li çarmedora cîhanê kurd rabûn ser piyan.

nik û leşkerî bi ser tevgera mirovahiyê de diçe, lê tu encam bi dest nexist. Vê carê taktîk guhart. Serok Apo jî xwe re kire hedefa yekemîn. Hesabên împeryalizmê ev bûn; ger Serok Apo jî PKK'ê dîr bikeve, tu bandora wî li ser PKK'ê û herêmê namîne. Wê hingê dê PKK zû xilas bibe. Ji ber ku yê PKK'ê li ser piyan digire Serok Apo ye. Yê ku li Rojhilata Navîn şax vedaye, yê ku ji me re asteng e û bi mezinahiya xwe nav daye divê jî holê bê rakirin. Bi vî rengî dix-

rxandina derdorên kurd li ser mutalaya Doza Sedşalê:

Helwesta dozgeran siyasî ye

Tarik Ziya Ekinci li ser helwesta Öcalan diyar kir ku wî za paşerojê nekiriye û daxwaza aştiyê aniye zimên, lê dozgeran pêşî li vê yekê girtiye. Wî got, "Dozgeran, ji ku pêşniyara Öcalan a bo aşti û çareseriyaya siyasî di de bibin, mutaleyeyeke siyasî pêşkêş kir."

Her çend Doza Sedşalê, niha bi şeweyekî demdemî, ji rojava Tirkiyeyê derketibe jî, bi her aliyê li çar aliyê Kurdistanê sermijar e. Dûvedirêjî li ser nîqaş têne kirin. Li Êdîna çapemeniya cihanê jî, ji sergera rojên pêşin xwe rîzgar kiriye û hejêdî behsa aştiyê Serokê Giştî PKK'ê û Serokê Rûmetê yê KNK'ê Abdullah Öcalan û pêwistiya çareseriyê Kêşeya Kurd dike. Wekî din, bi tayariya nivîskarên tirk ku helwesta Amerîkayê ya resmî radigihînin, ji ber helwesta Tirkiyeyê tengezariya xwe diyar dikin û serdemê ji bo çareseriyê Kêşeya Kurd wekî fersendeke dîrokî dinirxînin. Mîmûnê: nivîskarê Milliyetê Şükriî Kdağ, ku wekî berdevkê artêşê tê naxandana zanîn ku divê nasnameya kurdan nasîn û Kêşeya Kurd bê çareserîkirin. Wî vê yekê, hîna jî gelek zanyar û weşkerên Tirkiyeyê, kurdan wekî tirk, zimakurdî jî wekî zaravayekî tirkî didin rakirin.

Wekî tê zanîn, di mutalaya ku serdozgerên Tirkiyeyê li dijî parastina Öcalan amade kiribû de, hebûna kurdan hêlînkarkirin. Li gorî mutaleyê, kurd weşkeran xwedî hemû mafên demokratîk mîrovane ne. Her wiha tê îdiakirin ku dewletê tu zilm û zordarî li kurdan nekirine û nebûye sedema koçberiyaya kurdan. Derdorên kurd li dijî vê mutalayê nîqaş gotûbêjên dûvedirêj digerin û wê, li aştiyê dîr û berdewama politîkaya li ser wê, bi nav dikin.


Tarik Ziya Ekinci:

Şirove ne karê dozgeran e
Nivîskar û siyasîmedarê kurd T. Ziya Ekinci da zanîn ku mutalaya ji rastiyê re û ne "hiqûqî" ye, lewre bi baweriyaya xwe, ravekirin û şiroveya siyasî ne karê dozgeran e. Ekinci, her wiha behsa mafên kurdan kir û wiha axivî: "Dev ji wê berdin, hîn kurd nikarin mafên xwe yên giştî bigihînin. Hîn li Tirkiyeyê çareseriyaya hemwelatîyan ne xwedî mafên giştî" in jî. Kurd bi tenê di warê bîkariyê de reyan, çûvîna leşkeriyê û dayîna xwe de wezîfedar in. Bi tenê çend daxwazên sinorkirî yên-axa û şêxên kurdanê. Mixabin hîn kurd wekî hemwelatîyan nayên hesibandin."

Ekinci bi pey van nirxandinan, bo nîrîndayîna nakokîya di nav mutalayê de,

ji hinek xebatên komîsyonên meclîsê naxandin dan û wiha got: "Aştan Hacıoğlu di Komîsyona Koçê ya Meclîsê de gotibû: 'Bi milyonan mirov ji cih û warên xwe hatine koçberkirin. Bêyî ku tu mafan bidin wan, mecbûr histine ku ew kes dev ji mal û erdê xwe berdin.' Lê mixabin rewşên bîrên tirk li hemberî vê rindanê dengê xwe demaxin."

Tarik Ziya Ekinci li ser daxwaza aştiyê ya Öcalan jî diyar kir ku wî doza paşerojê nekiriye û daxwaza aştiyê aniye zimên, lê dozgeran pêşî li vê yekê girtiye. Ekinci wiha dirêjî da axaftina xwe: "Dozgeran, ji bo ku pêşniyara Öcalan a bo aşti û çareseriyaya siyasî di avê de bibin, mutaleyeyeke siyasî pêşkêş kir." Bi baweriyaya Ekinci bi şewaz û tevgera Bülent Ecevit û Devlet Bahçelî Kêşeya Kurd çareser nabe, lewre kêşe ne kêşeya terorê ye.




Av. Ahmet Zeki Okçuoğlu

A. Zeki Okçuoğlu:

Dewlet aştiyê naxwaze

Parêzer Ahmet Zeki Okçuoğlu jî diyar kir ku dewletê li dijî kurdan stratejiya 4-T'yan; tenkîl, tezlîp, tehdît û temsîl bi kar tîne. Bi dîtina wî, ev stratejî pêşîn li hemberî ermenan, piştê jî li hemberî kurdan hatiye bikaranîn. Okçuoğlu got, mutalaya bersiva dewletê ye, lewre dewlet naxwaze aştiyê bike û bi kurdan re li hev were. Wî got: "Bi zorê em nikarin aştiyê bi dewletê bidin qebûl kirin. Divê em têkoşîna xwe bidomînin; heta ku dewlet mecbûr bimîne. Ji ber vê yekê divê em stratejiyeyeke nû deynin. Me li



Tarik Ziya Ekinci

hemberî dewletê tu sîc nekiriye. Wan em mecbûrî çekê kirine. Ji wan yek miriye, ji me deh kes mirine. Divê Öcalan ji bo yekîtiyeye navxweyî jî bang li kurdan bike."

Ali Özcan:

Dewlet dixwaze kirinên xwe bincil bike

Cîgirê Sekreterê Giştî yê HADEP'ê Ali Özcan ji raporên meclîsa Tirkiyeyê yê li ser koçberiyê bi bir xistin û got dewlet dil dike bi mutalayê kirinên xwe bincil bike. Özcan bal kişand ser rêxistinbûna kurdan û wiha peyivî: "Ji mêj ve, kengê kurdan doza nasnameya xwe ya neteweyî kiribe, dewletê gōtiye, 'ev serhildan e' û ew tepeser kiriye. Lê îro, êdî kurd jî diyar dikin ku ew îradeyek in. Dewleta Tirk, her çiqas di nava xwe de nîqaş dike jî, ji bo çareseriyaya Kêşeya Kurd nikare gaveke jixwebawer biavêje." Wî da zanîn ku Öcalan gavên jixwe bawer avêtine û di encamê de çî dibe bila bibe, wê çareserî xwe bide ser her tiştî.

Yavuz Koçoğlu (DBP):

Divê dewlet fersendê bide Öcalan

Cîgirê Serokê Giştî yê DBP (Partiya Aştî û Demokrasiyê) Yavuz Koçoğlu jî got, du aliyên şer hene û divê her du alî jî kêmasiyên xwe berbiçav bikin, da ku meseleyê çareser bibe. Koçoğlu diyar kir ku divê dewlet pêşniyarên Öcalan li ber çav bigire û fersendekê bidîye. Bi baweriyaya wî, ev dê ji bo vî welatî gelekî bikêr û baş be. Lê divê dewlet gavên jixwebawer biavêje. Koçoğlu wiha dirêjahiya da axaftina xwe: "Bi kampanyayên nijadperestî û şovemî, yên ku li dijî Öcalan hatine destpêkirin, dixwazin kêşeyê bêhtir bincil bikin. Her tişt li ser darvekirina Öcalan asê dimîne. Lê belê berê xwe nadin kêşeya-bingehîn."

NAVENDA NÜÇEYAN

Kurtenûçe

DGM BI AWAYEKÎ ŞEKLÎ DIGUHERIN

Pêşniyara guherîna Qanûna Bingehîn a ku ji du xalan pêk dihat roja 15'ê meha pûşperê ji aliyê Liineya Giştî ya TBMM'ê ve hate peirandin. Wezîrê Edaletê Hikmet Samî Türk îdia kir ku guherîna ji ber pêwistiyeke pêk hatiye, ne ji bo Öcalan. Serokwekilê Koma MHP'ê Ömer İzgi jî îdia kir ku, ew guherîna ji ber rêkiliyên di navbera DMME û Tirkiyeyê de pêk hatiye. Wî got ku dadgeha Ewropayê ji ber endamê leşkerî gelek caran Tirkiyeyê tawanbar dike. Li ser vê yekê Wezîrê Eqaletê yê berê Hasan Denizkurdu daxuyand ku di peyava darizandina Öcalan de guherîneke bi vî awayî nebas e. Bi baweriyaya wî dibe ku bi vî guherîna Doza Öcalan ji nû de bê dîtin. Li aliyê din DYP'ê û FP'yê daxwaz kir ku ne tenê endamê leşkerî bê vekisandin. Divê ji binî ve DGM bîn rakirin.

İŞKENCE HATE TESCİL KIRIN

Liineya Giştî ya Cezayê ya Dadgeha Bîlind, ligel ku Dadgeha Cezayê ya Giran a Manîsayê der barê 10 polîsên ku îşkence li 16 ciwanan kiribûn û dadgehê ew dabûn. beraatkirin doz xera kir. Doz dê ji nû ve li Manîsayê bê nixandîna û ji polîsên îşkencekar re wê 70 cezayê hepsê bê xwestin. Sema Taşer ku ji 16 ciwanan yek e, diyar kiriye ku ew ji ber biryara xerakirîna gelekî dilşad bûye. Wê daye zanîn ku piştî çar salan wan di têkoşîna xwe ya mafdar de encam standiye. Parêzera wan Sema Pektaş jî da xuyakirin ku her kes dizane ku her 16 ciwan li Emniyeta Manîsayê wekî mêvan nehatine sekinandin. Polîsan di îfadeyên xwe de îdîa kiribû ku wan îşkence li 16 ciwanan nekiriye.


KARMENDAN HUKUMET PROTESTO KIR

Di nav şîrîkên hikûmetê de zema bo karmendan derkete %20-25'an. KESK'ê li hemberî nezîktêdayîna diyarkirina meaşan ya yekalî li çar aliyê Tirkiyeyê dest bi çalakiya şewitandina bordroyan kir. Kedkarên saziyên dewletê, diyar kir ku, dema hikûmet bi şeweyekî yekalî meaşan zêde bike, wê îsal jî nikaribe mil bide bin barê xwe. Karmendan da zanîn ku encax ev kêşe bi Peymana Kar a Giştî çareser bibe. Divê navê de ziyareta IMF'ê ya bo Tirkiyeyê rastî çalakiyên karmendan hat. IMF naxwaze ku hikûmet, zemê li maesên karmend û karkeran bike. 15'ê meha pûşperê karmendên KESK'ê li Edene, Êlih, Eskîşehîr û Semsûrê çalakiya şewitandina bordroyan li dar xist. Li aliyê din li Stenbol, İzmir, Enqere, Bûrsa, Mîrsîn û Antalyayê karmendan çalakiya 16'ê pûşperê domand.

Ji ber peydakirina nasnameyeke nû;

NATO kete qeyrana stratejîk

Di cîhana



Rêzenivîs

1

NATO, hetanî duh li dijî sosyālîzmê "hêza berevaniya cîhana azad" bû. Lê, cîhan piştî dawîya salên 80'yî bi awayekî bi lez û bez guherî. Bi vê re NATO jî kete peydakirina 'nasname' û stratejiyeke nû. Lê di mercên îro de, ku hevkêşe pir zû diguherin, bi hêsanî peydakirina vê nasnameyê dijwar e. Wekî tê zanîn di civîna salvegera 50'an a NATO'yê de di vê riyê de gavên girîng hatin avêtin. Lê, ev bi tenê wekî pêşnûma ma. Tiştêkî zelal nîn e. Madem ku 'neyar'ê NATO'yê yê rastîn ji holê rabûye, ev rêxistina dêwasa, dê li ser kîjan esasî xwe bide jiyandin? Îro dijminêkî bi awayekî zelal hatiye nasandin tune ye. Wekî nivîskarê DYA'yî yê navdar Huntingon jî dibêje, ma 'şerê şaristaniyan' dêrî dadide? Ma divê cîhana xiristiyanan xwe li gorî vê saz bike?

Piştî ku teza Fukuyama ya bi navê 'dawiya dîrokê' pûç derket, mirovahî li ser rengê pêşerojê dîtînen xwe tîne zimên. Guherîna stratejîk, a ku li derdorê NATO'yê tê gengeşkirin û hetanî radeyekê wekî biryar hatiye diyarkirin, pesendkirina "Operasyonên li derveyî pêgeha NATO'yê" ye. Bi vê re NATO ne tenê 'rêxistina berevaniyê' ya her du aliyên Atlantîkê ye, her wiha li ser tevahiya cîhanê hêza êrîşkar a leşkerî ye. "Operasyonên li derveyî pêgehê" wekî stratejiyeke nû hatiye diyarkirin.

Di pêvajoya Şerê Kendavê de, hema bêje, refgirtina hemû cîhanê ya li dijî Saddam, Neteweyên Yekgirtî derxistibû pêş. Di gengeşiyên wê demê de dîtîneke wiha derketibû pêşberî me: NY rêxistina mudaxelayê ya împeryalîzmê ye û NATO jî hêza wê ya leşkerî ye. Lê ev dîtîna jî nehate selmandin. Bi rûdanên din re NY'ê bandora xwe ji dest da. Di serdema dagirkirina Kûweytê de Sovyetistan kete xeta taktîk a Amerîkayê. Lewre ji Neteweyên Yekbûyî werê hat ku Sovyetistan ketiye bin bandora wê. Temenê vê îtîfaqa fireh zêde dirêj nebû. Koneya Ewlekariyê ya ku biryarên operasyonên leşkerî yê NY'ê dide, bi yekcarî parçe bû. Li aliyekî



DYA û Îngilistan, li aliyê din Rûsya û Çînê cih girt; Fransayê jî di navê de cih girt, lewma jî ev sazî xitimî û nema karibû biryaran bigire.

Piştî Şerê Kendavê her roja ku çû NY sist bû û ji navenda polîtîkaya cîhanê dûr ket. NATO'yê şûna wê dagirt. Niha wezîfeyên ku berê bo NY'yê dihatin fikirîn, dikevin ser milên bo NATO'yê. Heta ji vê wêdetir, bi hin biryarên ku di bin banê wê de tene girtin re NATO ji bo jendermetiya cîhanê xwe saz dike. Rûdanên berbiçav ev in. Lê emê hinekî li tiştên sergirtî bikolin. Ji bo ku mirov binê stratejiya pêşerojê ya NATO'yê bikole, divê li ser taybetmendiya bingehîn a 'Pergala Cîhanê Nû' hûr bibe. Piştî ku sosyālîzm hilweşiya, hevkêşeya durefî (iki kutuplu) ya cîhanê rûxiya. Di vê pêvajoya demdemî de DYA bi awayekî berbiçav derketê pêş. Lê taybetmendiya esasî ya PCN'ê ev nîn e; di destpêka salên 90'yî de ji aliyê hêzên mezin ve lezginîya jî nû ve parvekirina cîhanê ye.

Ji bo parvekirina cîhanê qayîşkêşaneke dijwar

Îro li cîhanê hêzên heyî gelekî ji hev cuda ne. Di polîtîkaya li ser cîhanê de 5 hêzên sereke hene: Amerîka, Ewrûpa, Japonya, Rûsya û Çîn. Ji nav van sê hêz, di pêvajoya îro de, di polîtîkaya PCN'ê de aktîftir in. Amerîka, Ewrûpa û Rûsya bo parvekirina cîhanê bi awayekî tûj di pêşbaziyê de ne. Di roja îroyîn de serdestiya Amerîkayê darî çavan e. Lê, dema ku mirov li rûdanên îroyîn dinihêre, mimkûn e ku hevkêşe serê her kêliyê biguherin.

Îro di parvekirina cîhanê de hêzên

herî aktîf Amerîka û Ewrûpa ne. Rûsya jî, li dijî mewziyên ku ji dest diçin, bi hêrs û gir e. Japonya jî li gorî hevkêşeya Pasîfikê, bi awayekî bêdeng û nerm, tevdiqere. Dema ku Amerîka û Ewrûpa tim di nava pêşbazîya parvekirinê de bin, stratejiya nû ya NATO'yê dê çawa bê meşandin? Hêzên ku bi PCN'ê re ketine nava liv û lebatê, li ser îradeya navendî ya NATO'yê tesîreke rûxîner (yıkıcı) pêk tînin. Di 50'emîn civîna NATO'yê de ev yek eşkere bû. Pêşnûmaya ku Îngilistan û Fransayê pêşkêş kir, piştî nîqaşên gur û li dijrabûna Tirkeyeyê, bi temamî nebe jî, hate pesendkirin (tasdiqkirin). Ev pêşnûmaya bi navê 'Nasnameya Ewlehî û Parastina Ewrûpayê(ESDİ) rêxistina leşkerî ya Ewrûpayê diparêze. Bêguman ev rêxistina leşkerî, dê di nava sînorên NATO'yê de bê sazîkirin, dê ji teknîk û binesaziya wê sûd wergire. Ev sazî bi tenê welatên ewrûpî di nava xwe de di hewînê. Ev nakokîya di nava NATO'yê de tiştêkî ji rêzê nîn e. Encama mantalîteya hevkêşeya cîhanê û ji nû ve parvekirinê ye.

"Cîhana Sêyemîn" deryaya xizanan a kapîtalîzmê ye. Di vê deryayê de her roj bi hezaran kes dixeniqin. Ji ber vê jî, mirov dixwazin biçin giravên zengînên li Rojavayê. Di encama vê de, di roja îroyîn de, pêleke mezin a koçberiyê derketiye holê. Wekî tê zanîn koçberiyê ketiye wiha berî Şerê Cîhanê yê Yekemîn rû dabû. Amerîkayê wê hîngê ev pêla koçê helandibû. Hetanî radeyekê Amerîkayê jî vê koçberiyê hêz wergirt. Lê îro keştî tijî bûye. Koçberiya ku wê demê hêz da 'Cîhana Nû', îro bûye barekî giran. Ev bo Ewrûpayê jî wisa ye. Gelek deverên 'Cîhana Sêyemîn' bo

NATO her çiqa xwedî hêzeke mezin a leşkerî û teknîk bû, jî, ji ber valahiya stratejîk di nava qeyranê de ye. Dema nava NATO'yê de du serî hene; Amerîka û Ewrûpa. Ev her du hêz xwedî stratejiyên ji hev cuda ne. Lewre jî hejîneke bi çûk a di hevkêşeya cîhanê de dibe ku bi xwe re, bi temamî serobinbûna pergala împeryalîzmê bîne

pêşerojê kapîtalîzmê bûne herêmên xeternak. Bo nimûne; ger li Rojhilata Navîn; li Tirkîye, Misir, Erebaştanê; li Amerîkaya Latîn jî li Meksîka, Brezîlayê serûbîniyek pek bê, ev bo împeryalîzmê pir xeternak e. Li aliyê din di navendên împeryalîst yê di nava NATO'yê de, xwe bo parvekirina cîhanê amade dikin. Ev yek jî îradeya navendî ya wê saniyê dirûxîne.

Tiştên ku di encama Şerê Kendavê de li serê Neteweyên Yekgirtî qewimîn, dibe ku piştî Şerê herêma Balkan li serê NATO'yê jî biqewimin. NATO û Amerîka yek in. Li dijî hebûna Sovyetistanê, ev yek bo Ewrûpayê zêde ne mesele bû, lê, di hevkêşeya cîhana îroyîn de meseleyeke mezin e. Stratejiya NATO'yê ya di Şerê herêma Balkan de ji ber dubendiya Amerîka û Ewrûpayê xitimiye. Lewre jî dibe ku NATO di encama vî şerî de têk bibe an jî herî zêde 'Serkeftina Pyrus' bi dest bixe. NATO'yê her çiqa xwe bi teknîkê saz kiribe jî, ji ber valahiya stratejîk ketiye qeyranê. Wekî ku generalekî amerîkî jî dibêje; teknîk nikare valahiya stratejîk dagire. (Strategi Revîew, bihar '96) Şerê herêma Balkan, bi awayekî eşkere, ev yek rastaniye. NATO digel hêza xwe ya leşkerî û teknîk jî ketiye qeyranê. Lewre di warê stratejîk de di valahiya de ye. Her wiha ji ber ku di nava wê de du refên xwediyê stratejiyên cuda hene di pêvajoya qeyranê giran de ye. (Dê bidome)

Min taybetiyên zimanê Siyabend û Xecê

SAMÎ BERBANG

Çend şayesên gelêrî

Tamarên eniyê mîna çonga devan rane: pir bi hêrs ketiye
Dilê wî mîna çivîkekî serjêkerî perpiftî: bi heyecan û peroş bû.
Siyabend bi dilekî ne bi heft dilan Xecê band (ev şayeseke hevpar e, di gelek berhemên gelêrî de bi ber çavên mirov dikeve.)
Minanî teyroka biharê li Qedê tîr reşan-

Wekî teyrokan lê reşandin: Di tirkî de di cihê vê şayesê de dibêjin, 'agmur gibi yağdırıldı.'

Erebê lêvdeqandî
Erebê lêvdeqandî da ser rê; nesekini, nexar, raneza; şev kire roj, roj kire şev bi lez û şû, xwe gihande Beriya Şikaka.

Ev jî motifekî balkêş e, li vê derê vî kesî Bekoyê Ewan û pîra sêhrdar girtiye ser lîlê xwe

Yê sax ew bû ku ji mala xwe nehatibû
 Ev jî qalibekî hevpar e û di gelek destanên de jî tê dîtin.

Felek kapa xwe hilo davêje, gûzên xwe meriv dide jimarê
 Ango mirov nikare bi felekê re kapan vêje.

Bi lingên hespên xwe ji mirinê xilas an.

Aliyê pîvanên rêzimanî ve zimanê pirtûkê
 Her wekî berê jî hate gotin di nava pirtûkê

de digel çend xalên balkêş ên rêzimanî gelek çewtiyên rêzimanî jî balê dikişînin.

Di pirtûkê de mînakê heye ku ji hêla rêzimanî ve gelekî balkêş e, heke tê de çewtiyeke rastnivîsî nîn be hêjayî nixandinê ye.

Li cihekî "şivîn jê pîrsî" hatiye gotin. Her wekî tê zanîn peyv şivan e, li vê derê tewiya-ye. Tê zanîn ku navdêrên nêr bi du awayan ditewe, li hin herêman qertafa /-i/ tê dawîya peyvê, (heke wisa bûya diviya ev hevok wiha bûya 'şivanî jê pîrsî', lê ne wisa ye) li hin herêma jî peyvên ku tê dengdêrên /a/ û /e/ he ne yek ji wan tîpan dibe /ê/. Li gorî vê rêpîvanê jî diviya hevok wiha bûya 'şivên jê pîrsî', lê li vê derê tişteki din pêk hatiye, dengdêra /a/ bûye /î/. Mirov dikare bibêje ku qertafa tewangê /î/ cihê dengdêra /a/ girtiye. Di hin devokên Dêrsimê de jî em rastî heman rêpîvanê hatibûn, ev mînaka jî devoka Serhedê jî vê dîtîne diçêspîne.

Xaleke din ku li ser zimanê herêma ku destan jê hatiye berhevkerin agahiyê dide çend rêzên li xwarê ne:

*"Xecê ca tu were vê derê!
 Ji min re bîne tasa di avê!
 wez im...
 Qedegêtranê salê wez im...
 Xecê rica dike ji Hesenê pismamê wê
 Dibê tu bidî xatirê di Xudê
 Ca bihêle ez herim ser Qedê..."*

Di nava wan rêzan de /di/ yek balê dikişîne ser xwe. Ew daçek naşibe /di/ yên din, lewre ne qertafa dema niha ye, ne jî pêşdaçeka ku cih nîşan dide ye. Ew /di/ ketiye navbera veqetandek û navdêrê. Wekî "xatirê di Xudê" û "tasa di avê", ev daçek xweditiyê diyartir di-

ke. Hinekî dişibe /the/ va inglizî. Lê peywira wê jê cudatir e. Lewre di dema îzafeyê de derdikeve holê. Ew di hin devokan de bi dawîya veqetandeka pirjimarî ya binavkirî /ên/ ve di-be wekî "zarokêd min" an jî "zarokê min"; di hin devokên kîrmanckî de tê ber cînavkên kesane û ew cînavkên "ev, aye, înan" dibin *dev, daye û dînan*.

Çewtiyên rêzimanî

Di nava destana Siyabend û Xecê de çewtiyeke rêzimanî ku bi rêk û pêkî hatiye dubarekirin tevliheviya pirjimarî ya bi alîkariya lêkerê ye. Di nivîsê de pirjimarî ya lêkerê her tim li gorî kirde hatiye pîvandî. Wate, li her cihê ku kirde pirjimar bûye, lêker jî wekî pirjimar hatiye kişandin. Lê wekî tê zanîn di kurmanckî de lêker her tim li gorî navdêr û cînavkên xwerû tê kişandin. Lewre jî dema di hevokê de kirde tewiyabe, lêker li gorî bireser tê kişandin. Li ser van mînanan ravekirina mijarê dê mijarê sayitir bike. Di mînanan de awayê di pirtûkê de bold e rast jî îtalîk hatiye nivîsandî.

Ap û amojnê mîna dijminan rika xwe kutabûnê

Di vê hevokê de kirde "ap û amojin" in û bireser jî rik, jî ber ku rik nayê jimartin divê mirov wê wekî yekjimar bihesibîne. Lê derê pirjimarî ya di lêkerê de divê pirjimarî ya "rik"ê nîşan bide, ne pirjimarî ya kirde.

Ap û amojnê mîna dijminan rika xwe kutabûyê.

Jinên cînan digirtin kerik nan didanê

Jinên cînanan digirt, kerik nan didayê
 Wan (pirjimar) ew (yekjimar) didayê (yekjimar)

ku digotin felekê Siyabend kiriye vî halê hanê

Ku jinên gundî digot: "Felekê Siyabend kiriye vî halê hanê."

Wan digot wê ew kiriye vî halê hanê.

Ap û amojnê Siyabend dane nav hev û bi ço û daran va ew kutan.

Ap û amojnê Siyabend daye nav hev û bi ço û daran ve ew kutaye.

Wan ew daye nav hev û bi ço û daran ew kutaye

Kevirên girûz jê re berpar bû

Kevirên girûz jê re berpar bûn

Ew ji wî re berpar bûn

Di vê mînakê de tevî ku kirde pirjimar e jî, lêker yekjimar e.

Yeşîn yan gur û hurçan wî xwarin ya jî şêr pilingan wî perçekirin.

Yeşîn yan gur û hurçan ew xwar ya jî şêr û pilingan ew perçe kir.

Di vê mînakê de du xeletî bi hev re hatine kirin. Li aliyekî di cihê cînavka xwerû de ya tewandî hatiye bikaranîn, li aliyê din jî lêker li gorî kirde hatine kişandin.

Wana zulmek bêhed û bêhesab li min kirin.

Wan zulmeke bêhed û bêhesab li min kir.

Wan ew li min kir angî li vê derê jî ber ku zilm yekjimar e divê lêker jî yekjimar be.

Birayên wê silav li mêvanan kirin

Birayên wê silav li mêvanan kir.

Li vê derê divê lêker li gorî bireser (silav) bê kişandin. Silav jî jî ber ku nayê jimartin, yekjimar tê hesabandin.

Îslam û kurd

DR. HUSEYNÊ XELIQÎ

1400 sal e netewey kurd legel ayinî îslam û ferhengekey aşna ye. Be leberçawgirtinî deqekanî Quran, debê legel gişt netewemuslimanekan bira bêt, ke çî le dirêjayî mējûy serheldanî em ayînewe, kurd wek neteweyekî musliman le layen xawen deshelatemisilmanekanewe çewsawetewe. Qetil û bir kirawe, be zor le zêdî derkirawe û kirawete goştî demî top û be aşkira hemû mafêkî pêş şêlkirawe.

Her le xelîfekanî Emewî û Ebasî û Osmanî û Sefewiyewe bigire heta sultane nawdêrkirawekan be "sêberî xwuda", kurdiyan xistiwe ber pelamar û wek hawwilatî pileduhem û dîl û koyle, çawî lê kirawe. Le baştirîn bar da rolekanî netewekeman kirawnete qelxanî

desthelatî nigrîsî fermanrewakan. Her ke daway mafî xoyan kirdiwe be tunditirîn şewe hêrîşkirawete seriyân û xakî kurdistanîyan be xwênî ew xelke beşxurawe sûr kirdiwe.

Nimûney zeqî reftarî em deshelatdarane le çaxî ême de fitway cîhadî serkirdekanî deshelatî komarî îslamî Îran dij be xelkî musulmanî Rojhelatî Kurdistan lew wîlate ye ke akamekey ziyatir le 50 hezar kujraw le rolekanî netewekeman bû. Bêcge le ewe deyan hezar le karkirdin bêbeşkiraw û hezaran kurd perîwey henderan bûn. Hezaranîş le çalereşekanî deshelatî îslamî de kewtine ber dirindanetirîn eşkencewe.

Hikûmetî Iraq Helebce û çendîn gundî başûrî Kurdistanî xiste ber rijnebaraney bombey kîmyawî û ziyatir le 15 hezar kes giyanîyan le dest da. Be diway de 182 hezar kes be kelkwegirtin le deqî Quran enfal kirañ. Ke çî hîê kor û komelekî îslamî ne ke her le ber ewe ême musliman nîn belku le ber eweş

Quran berawajî kirabuwe we rexney le deshelatî Iraq negirt û birayetî îslamî bo ême hîç qazancekî tê da nebû.

Katêk Serok Ocalan necewanmêrane gîra û dira be Turkiye, dayikî serbazehêrîşkerekujrawekan bo ser Kurdistan be rûbendey îslamiyewe daway sizadanî kesekiyan dekird ke le mafî neteweyekî bindest be pê hemû prensîpekanî cîhanî parêzgarî kirdibû. Le beramber sitemî dirindaney Turkiye sebarete be netewekey rawestabû. Em daykane û gişt musulmanekanî Turkiye ke dehan sal e le ber çawîyanewe kurdî Bakur qelaço dekirê, miteqiyân pêwe nehat û carekîş le çîwarçewey emir be çake û nehîle xirape da dij be ew siteme zariyan nekirdewe. Carek neyangot: Le ber çî minalekanî ême le Kurdistan da rolekanî netewey kurd dekujin û maliyan kawil dekin? Êsta êmey kurd detwanî bîjin xawen yek milyard bira û xuşkî musulmanan înan?



“Revandineke Zindî”: Fehmi Tosun

Dayê! Bavê Min Direvînin...

Fehmi Tosun, berî vê bi 5 salan li ber çavên zarok û şênîyê taxa xwe hate revandin. Lewre revandina wî jî wekî serpêhatiya gelek ‘revandiyan’, “revandineke zindî” bû. Hevala wî Hanım Tosun ev 5 sal in li her derê doza hevalê xwe dike. Ji bo vê jî serî li DMME daye.



Hanım Tosun

dixebitin ku Fehmi bi darê zorê bixin taksîyê. Fehmi ji bo ku nekeve taksîyê li ber xwe dide, lê polîs bi kulmisk û pehnan zora wî dibin. Fehmi Tosun ji aliyekî ve, mîna ku bizanibe ka wê çî were serê wî, hewl dide nekeve taksîya spî, ji aliyekî ve jî diqîre û dibêje: “Hawar...! Min direvînin.”

Dayik û kurê wî, heta ku bi lez û bez dadikevin xwarê, taksîya spî, tevî deriyê niv vekirî û lingê Fehmî yê li derve mayî, lê dixebite ku di nava toz û dûmanê wînda bibê. Lê, ji ber ku li ser rê zarok hene, nikare bilezîne. Wer xuya ye, kujeran an ji ber ku devê wî girêdaye yan jî derbeyeke giran lê dane. Fehmî nema dibêje, “Hawar li min!” Îcar dora qêrîn û hawarê tê Hanım Tosun: “Hawar... Hawar li min! Mêrê min direvînin... Plaqa ya wê bigirin.” Hanım, ji ber ku encama vê revandinê dizane, her digirî û dike qêrîn û hawar. Zarokek dibêze, tê cem wê û dibêje, “Xaltî, min plaqa girt.” Cînarên wê, ku di pencereyên xwe de li bûyerê temaşê dikin, bi armanca alikariyê telefonî polîs jî dikin.

Piştî demekê, dereng be jî, komek polîs lê ber derî; Hanım bûyerê ji wan re vedibêje û nimeroya plaqê dide wan. Polîs, bi hinceta ku îfadeya Hanımê bigirin, wê dibin Qereqola Avcılarê. Hanım, hemû tiştên ku bi çavê serê xwe dîtine ji polîsan vedibêje. Di vê navberê de polîs, bi lêkolîna li ser nimeroya



Hanım Tosun, yek ji Dayikên Şemiyê ên herî çalak e.

plaqaya wê dixapînin. Lewre piştî demekê, ji Hanımê re dibêjin, “Ev plaqê sexte ye.” Li ser vê yekê Hanım li ber polîsan radişe. Îcar polîs di ser wê de diqîrin û dibêjin: “Tu ji ku zanî, ew polîs in!” Hanım li wan vedigerîne: “Kesî heya îro doza mêrê min nekiriye û tu dijminên wî tune ne.” Piştî vê yekê ew dîsa dibêje, yên ku mêrê wê revandine polîs in. Ji ber vê hindê polîs madê xwe tîrş dikin û awiran bi wê vedidin.

Li pey van bûyeran, Hanım li ser bûyerê nameyekê dinivîse û dide polîsan. Roja din qereqola Gayrettepe gazî wê dike û ji wê pîrsa çalakiyên siyasî yên Fehmi dike. Hanım li wê derê fêr dibe ku, mêrê wê, roja ku tê revandin, hevalê xwe yê kurd Hüseyin Aydemir dibîne. Ji wê rojê wir ve, wî agahî û dengûbas li ser Hüseyin Aydemir jî nehatiye hilanîn. Wer diyar e, polîsan ew jî heman rojê revandiye, lê nayê zanin ka polîsan ew ji ku derê revandiye. Hanım digihêje wê baweriyê ku Fehmî li deverêke din li taksîyê hatiye siwarkirin, lê Fehmi ji wan re çî gotiye, ne diyar e. Bi baweriyê Hanımê, wan bi dek û dolapan ew aniye ber deriyê malê; dawiye, ji ber ku fêm kiriye ew tê revandin, di nava dest û lepên polîsan de bi wan re pev çûye û kiriye hawar. Hanım wer difikire ku Hüseyin Aydemir jî bi taksîyêke din hatiye revandin.

Di ser bûyerê re 5 sal derbas bûn, lê Hanım, hevalê xwe, bavê zarokên xwe, hîna jî di dijê xwe de vedişêre. Kurê wê yê herî mezin, piştî windabûna bavê xwe, neçar dimîne ku dest bi kar bike û bi îhtîmala xwe yê kêr, hewl dide debara malê bike. Lêzîm û meryên Hanımê jî piştigiriya wan dikin; wan bi hev re parêzer girtiye û serî li Dadgeha

Mafên Mirovan a Ewrûpayê DMME’yê daye. Ev bi salan e ji dadgehê tu encam an jî agahî nehatiye wergirtin. Hanım ber xwe dide, di nava hewldanan de wê lê ji kesî tu deng dernakeve.


Min Hanım Tosun îsal, li Cenevreyê di dema danîşîna Koma Mafên Mirovan ya Neteweyên Yekbûyî de dît. Wê, di Kongreya Windahiyên Cihanê de, ji xizmetên windahiyên cihanê re, eşîtiya kesera dilê xwe anî ser zimên. Ew dibêje: “Bi salan e çavên min li riya wî qerandîm. Ev êşeke giran û dijwar e. Lewre kuştin û qetlîkirinê gelekî dijwartir e. Mîna ne ji Hüseyin ne jî ji Fehmî tu agahî min neaniye.”

Di vê navberê de, Hanım dîsa ji çî ji destê wê tê dike, her û her pîrsa hevalê xwe dike. Ew, yek ji Dayikên Şemiyê ye.

Fehmî çima hate revandin? Ew kurdekî liceyî bû; karkerekî di halê xwe de bû. Li vê cihanê ji kesî tiştê hev nedikir. Wî, bi tenê, wekî her mirovî doza ziman, çand û mafên xwe yê rewê dikir. Wî, hewl dida xwedî li keda xwe derkeve, bi kesekî nede xwarin; di civakê de biçûk nayê dîtîn û her wiha bibe endamêkî azad û bi rûmet yê cîvaka azad. Ango wî dixwest bibe kurdekî azad.

Ew, di sala 1991’ê de, bi hinceta ku alikariya PKK’ê kiriye û endamên wê hewandine, tê girtin û sê salan di girtîgehê de dimîne. Piştî ku ji girtîgehê derdikeve, gelek caran tê binçavkirin û gef lê tên xwarin. Lewre ew mala xwe bar dike, diçe Stenbolê. Li wê derê, li Avcılarê, di xaniyekî erzan de bi cih dibe. Wî hewl dida ku bi destfiroşiyê (seyyar satîcî) debara zarokên xwe bike...

AYDIN DERE/ SWÍSRE



Mahmut Döken

*Xelata min bigire û wînda neke yadê!
Û negirî dema te lê nihêrî
Dem nemaye ji girî re
Û ne dema xemgîniyê ye.
Bi ser hevdu de hêstirên xwe
Emê bi hev re bigirin
Roja azadiyê
Li ser kevîrekî Çiyayê Cûdî rûniştî*

(Çiya Mazî)

Dîsa em bi hevdu re ne; birayê delal, bavê me, apê me û xalê me. Silav li te be, di salvegera koça te ya dawîn de, em tu car te ji bîr nakin.

**Li ser navê malbata wî:
Sîdar, Dewran, Rojbîn, Serhat, Welat, Gulê**

LI NÇM'ê ya İzmirê

- 19.06.1999 şemî, Konsera Koma Azad, saet: 17:00,
 - 20.06.1999 yekşem, Konsera Koma Azad seansa yekem, saet: 15:00, seansa duyem, saet:18:00
 - 25.06.1999 in
- Konferans: Di dîrokê de tevgerên Siyasî yên kurdan
Beşdar: Ismail Gôlbaş
saet: 18:00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



LI YÇKM'ê

- 19.06.1999 şemî
- Konsera Kevoka Şîn, saet:17:00
- 20.06.1999 yekşem, Teatraya Akîs "Girav (Ada)", saet: 16:00
- Li BEKSAV'ê
- 20.06.1999 yekşem
- Konsera Koma Amed
saet: 18:00

Bo xwendina pirtûkên girîng pêşniyazên Öcalan:


Nîşaneyên Hunera Serokatiyê

Ji niha ve kurd derketine nêçîra pirtûkên ku ji aliyê Öcalan ve hatine pêşniyarkirin û xwendevan li "qulika mişkan" lê digerin!

Xwendevan gelek wextan li benda pêşniyazan in ku li gorî pêşniyazan, pirtûkan bixwînin. Di vî warî de pêşniyazên Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ji aliyê girseyê ve bi awayekî germ tene pêşwazîkirin. Tira her pirtûka ku Serokê PKK'ê qala wê kiribe di heman demê de berz bûye.

Li gorî wê yekê, gava ji bo xwendina pirtûkê pêşniyazê kirin xwendevanên kurd lez didin xwe, da ku wê pirtûkê bixwînin. Wekî mînak; Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan gava di sala 1995'an de behsa xwendina pirtûka bi navê "Hunera Şer (Savaş Sanatı)" a SUN TZU kir, ku ev pirtûk naveroka wê li ser şer e, xwendevanên kurd bi lezîni berê xwe da pirtûkxaneyan da ku wê pirtûkê peyda bikin. Dîsa dema ku Serokê PKK'ê çû Romayê qala Dewrêşê Evdî kir. Rojname û kovarên me jî dest bi weşandina çîroka Dewrêşê Evdî kir û xwendevanên me jî li pirtûka wê çîrokê geriyar, da ku bixwînin. Dîsa di


demên dawîn de Serokê PKK'ê di nameyê xwe de ku ji İmraliyê wekî bersiv ji çend girtiyên ji doza PKK'ê yên jin re şand, qala xwendina pirtûka Gilgamiş kiribû. Dû wê, xwendevanên kurd berê xwe da wê pirtûkê ku bixwînin û jê tiştêkî fêm bikin. Dîsa Öcalan di xweparastina xwe ya ku di dozê de kiribû de jî behsa pirtûka Leslie Lipson a bi navê "Şaristaniya Demokratîk (Demokratik Uygurluk)" kiribû. Her wiha Öcalan ragihandibû ku xwen-



devan ji ber ku Rojhilata Navîn baş nas bikin bila pirtûka Ramses (1,2,3,4,5.) û Siyasetnameya Nîzam-ül Mulk jî bixwînin. Di heman katê de xwendevan ketin hewla peydakirina van pirtûkan.

Me jî xwest li dû van pêşniyazên ku ji aliyê xwendevanên me ve wekî talîmatekê tene dîtin qala çend weşanxaneyan û pirtûkên ku di van weşanxaneyan de derketine bikin da ku barê lêgerîna xwendevanên xwe hêsan bikin.

Weşanxaneya Yurt'ê (Yurt




Kitap-Yayın) piştî salên 1990'î ji ber ku pirtûkên İsmail Beşikçi weşandin gelek ceza xwar û gelekî zehmetî jî kişand. Demekê bêdeng ma. Vê weşanxaneyê di sala 98'an de xwe nû kir û ji nûve dest bi weşandina pirtûkan kir. Bi taybetî pirtûkên Yurt'ê yên mîtolojîk ji aliyê xwendevanan ve bi awayekî baş hatin pêşwazîkirin û hatin xwendin. Pirtûka Gilgamiş ku Serokê PKK'ê ji hevrêyên xwe re pêşniyaz kiribû jî wê weşanxaneyê weşandiye. Çend ji pirtûkên weşanxaneya Yurt'ê ev in: Keleha Fedayîyan; Alamût, Gilgamiş, Ömer Hayyam, Şamaş û hwd. Ev pirtûkên ku bi awayekî mîtolojîk hatine nivîsîn serdemekê ronî dikin. Di nav rûpelên van pirtûkan de kurdan û axa kurdan jî cihê xwe girtiye.

Xwendevanên kurd û weşanxane jî dibêjin ku pirtûkên ku Serokê Giştî yê PKK'ê pêşniyaz dike pirtûkên hêja ne û ev pirtûk ji aliyê xwendevanan ve zêde tene xwestin.

CEMİL ANDOK

ÇAVDÊRÎ



Du stratejî

MİRHEM YIÇIT

Li Girava İmraliyê du stratejî ketine pêxêra hev. Yekê militarîst û yekê aşîxwaz. Li aliyekî desthilatdarên dewletê û li aliyê din serok û berdevkê tevgera rizgarîxwaz. Mehkemeyek li dar e; yekalî û nerewa, bêwijdan û bêhewedarî. Sûcdar raser in, bi zimanê hêz û serdestiyê qise dikin, ha ew ha gurê di çîroka Lefontain de, di nav wan de tu ferq tuneve.

Xwedîcube biqîrin: "İdam! Mirin! Kuştin!" Yek netewe! Yek ziman! Yek A! Xweziya min bi dilê wî kesî ku tirk e!"

Xezeb ji wan dibare, kef bi devê wan ketiye, çav di nava serê wan de bûne pizot, firnikê pozên wan hiltên û datên û ji bo dermanan be jî jî devê wan ji bo Xwedê tu bêjî gotineke xweş jî dernakeve.

Delêlî û şûrkêşên şer nav di hev de didin, hevdu sor dikin, kirine qîr û qiyamet û wan tepetoz rakiriyê: "Wernê! Va ye ye ku em lê digeriyan, bermedin, dilê xwe lê rihet bikin, bêhna xwe lê berdin!"

"Ya star! neûzûbilah!" digot pêşiyên me ji bo kesên wiha. Giş rik û kîn e, tev bûne hêrs, nehişne, ji ser xwe çûyî ne, gotina pêşîn û paşîn dibên xwîn, serjêk dibêjin, tiştêkî din nayê bîra wan, nizanin, devê wan nagere bêjin. Ev stratejiya serdestên tirk, hiqûqnas, siyasetmedar, xwedîqelem û medyaya wan.

Ev pazdeh sal in şer didome, 30-40 hezar mirov hatine kuştin, welat bûye dojeh, ked û xwêdana milyonan ji hevdu xeniqandin û hevdu girandineke dualî re dibe erd û ji wan re ne derd e, ne xem e. Ew li ber kesî nakevin, hişê wan bi tenê li ser meqam, bêrik û malbatên wan e. Zarokên xwe dîrî şer digirin, çendî karin li cihên ewle bi cih dikin û komelanê zehmetkêş ji bo berjewendiyên xwe dikin sûr û keleh, dehf didin nav êgir, dikin mertal û gorî.

Stratejî ewqasî bêyom, dilkevir, bêbav û xwedênenas e. Giram û derhemek berpirsiyarî, liberketina mirovan, dilteniktî û dilweşawati nemaye tê de, ji her xisletekî ku mirovan dike mirov hatiye guhaştin, hatiye dawerivandin. Serketina wê stratejiyê ji hejmarek patron û bazirganên xwînê pê ve ne li xêra tu kesî ye.

Em bêne ser stratejiya duyem. Ew jî ya Apo ye, ya gelê kurd e, ya wan dê û bavan e ku li dijî şer in, ya her kesî, her kategorî, çand, xet û rêbazê ye ku hez ji kuştin û mirinê nakin, evîndarê azadiyê û li aliyê jiyane ye. Ev stratejî xêrxwaz û qencîxwaz e, dê bibe destpêka qonaxeke nû, bihevrebûn û dewlemendiyeke heralî. Ger bi ser bikeve ev stratejî berî her tiştî dê ev xwîna ew qas sal in dirije bisekine, pere û kapasîteya ku bûye ava aşê xerabkirin û wêrankirinê dê tekeve xizmeta avakirinê. Ev jî dê bi xwe re birayeti, toleransê, demokrasiyê xurt bike; dê çareserkerine pirsgrêkên civakî, neteweyî, çandî û hwd. hêsantir bike. Ji bo stratejiyê wiha jî mirov çendî fedakariyê bike mezinahî ye, bîrbirin û pêşbînî ye. Tiştê ku di dadgeha İmraliyê de Serok dike, ji aliyê hin kesan ve bi xeletî tê şîrovekirin, hê nehatiye fêmkirin jî ev yek e.

Nûkirin û qewînkirina stratejiyan, sererastkirin û biserûberkirina wan, karê stratejiştan e. Serok stratejiyê serketî û dîrbîn e. Ji yana wî ya heta niha ev ispat kiriye, dost jî dijmin jî wê dizanin. Tiştê serok ji kurdan re kiriye ne hindik e, tîra sedsal û qirman heye. Ew bûye xezîne, qubletname, exlaq, çand û kaniya ku qet naçîqe, namîçîqe. Bila kes neheqîyan neke, ne wextê neheqîyan e.

CHRISTIAN JACQ
RAMSES



REMZÎ KİTAVEVÎ

Çavê Bapîrê Me



Li gorî qanûnên Tirkiyeyê û peymanên navneteweyî li cihên wekî Heskîfê çêkirina avahiyan qedexeyê ye. Her çend hin xebatên kurdistanîyan jî hebin, kêmtirîn dengê wan derdikeve. Komên heyî jî, dema xebata xwe dikin, li gorî pîvanên 'îdeolojiya resmî' tevdigerin. Rojnâme-yên tirk jî xebatên kurdistanîyan wekî "çalakiyên terorîst" bi nav dikin.

qedexeyê.

Li aliyê din, heya îro tu komel û rêxistinên hawirparêz û surîştperwer, ji bo ku pêşî li vê komkujiyê bigirin, neketine nava tevgerê. Li Tirkiyeyê komelên hawirparêz ên mîna; Çekul, Çevko, Green Peac hene, lê tu deng ji wan dernakeve. Lewre, wekî di her warî de xwe dide xuyakirin, di vî warî de jî tesîra "îdeolojiya resmî" serdest e û ev komel, ji ber ku problem bi kurdan re têkildar e, bala xwe nadin ser.

Îro li Tirkiyeyê du kom jî bo rizgarkirina Heskîfê xebatê dikin: "Komîteya Rizgarkirina Heskîfê (Hasankeyfi Kurtarma Komitesi)" û "Koma Dilxwazên Rizgarkirina Heskîfê (Hasankeyfi Kurtarma Gönüllüleri Grubu). Koma yekem, ev demeke dirêj e, bi serkêşiya Sevim Şirvan xebata xwe dimeşîne. Koma duyem, di meha gulanê de hate sazîkirin û di bin sîbera Navenda Çanda Don Kîşot de dixebite. Vê komê, heta niha jî bo Heskîfê hin xebat kirine, lê vê komê xwe ji feraseta "dewleta pîroz" ne-

şûştiye. Lewre ev kom jî ne xwedan hêz û karîna e. Kom, dema xebatê dike, dibêje, "Gelo tiştê em dikin, wê ziyane bigihînin dewletê?" Her wiha dibêjin, "Bila dewleta me, ji ber vê problemê, li darê dinyayê rûreş nebe."

Şovenîzma di vî warî de, di qada navneteweyî de jî xwe dide xuyakirin. Her sal li ser navê avakarê Holdînga Ford Henri Ford, ji bo parastina berhemên çandî pêşbirkek tê sazîkirin. Îsal Koma Dilxwazên Rizgarkirina Heskîfê jî beşdarî vê pêşbirkê bû. Komê, ji bo pêşbirkê nivîsek amade kir û ji bilî tirkan behsa tu gelan nekir.

Xebatên kurdistanîyan


Îro, li ber destê dewletê 200 projeyên bendavê (baraj) hene. Hemû bendav jî wê li ser çemên Kurdistanê werin çêkirin. Lê, dewletê, ji ber ku rojek berî rojekê Heskîfê binav bike, pêşîn dest bi projeya Bendava Ilısu'yê kir. Ger ku bilindiya avê 50 metro be, wê Heskîf rizgar bibe û enerjîya ku dixwazînin ji wê bi dest bixin, wê pêk were. Lê armanc ne ev e û darî çavan e. Şênîyê Heskîfê berê 30 hezar bû, lê ji ber pest û kotekiyên dewletê, şênîyê wê daketiye 3-4 hezarî. Çeteyên li herêma erd û zevî gelek bi erzanî kirîne û gelek biha difiroşin dewletê.

Demek berê kurdistanîyan li Ewrûpayê jî bo rizgarkirina Heskîfê dest bi çalakî û xebatê kir. Lê rojnâmeya Cumhuriyetê ev xebat wekî "terorîzmê" bi nav kir. Cumhuriyetê giliya van kesan dikir û hema bêje ji dewletê re digot,

Wekî diyar e, bala kurdan li ser serok û azadiya wan e. Gelekî zehmet û dijwar e ku ew bala xwe bidin ser tiştêkî din. Li aliyê din komkujîya li dijî kurd û kurdistanîyan heralî ye û berdewam e. Lewre divê têkoşîna kurdan jî piralî be. Dewleta tirk vê dawiyê jî qesta Heskîfê dike, ku yek ji kevnaretirîn şûnewarên cîhanê ye. Wê ji bo bendaveke 50 salî, ev şûnewara bêhempa û dêrîn di bin avê de bimîne. Li gorî qanûnên Tirkiyeyê û peymanên navneteweyî li cihên wekî Heskîfê çêkirina avahiyan qedexeyê ye. Li dijî vê yekê, gelek komên tirkiyeyî û cîhanî dest bi rizgarkirina çalakîyên Heskîfê kir. Lê balkêş e, her çend hin xebatên kurdistanîyan jî hebin, kêmtirîn dengê wan derdikeve. Komên heyî jî, dema xebata xwe dikin, li gorî pîvanên

'îdeolojiya resmî' tevdigerin û dibêjin, "Bila li darê dinyayê rûreş nebe." Rojnâme-yên tirk jî xebatên kurdistanîyan wekî "çalakiyên terorîst" bi nav dikin. **JAN AMED**, ku demekê di nava Koma Dilxwazên Rizgarkirina Heskîfê de cih girtiye, li ser vê mijarê nûçe-lêkolînek amade kir.

Heskîf, bi taybetî van salên dawîn, bi avakirina Bendava Ilısu'yê re kete rojeva cîhanê. Lewre bi vê bendavê, wê ev berhema dêrîn û bêhempa di bin avê de bimîne. Ji ber vê çendê jî li cîhan, Kurdistan û Tirkiyeyê gelek kes lê dixebitin ku, pêşî li vê komkujiyê bigirin. Lê balkêş e, hem li gorî qanûnê Tirkiyeyê û hem jî li gorî peymanên navneteweyî yên ku Tirkiyeyê îmze kirine, li cihên wekî Heskîfê çêkirina avahiyan



A firandina şaristaniya Kurdistanê Heskîf, li rojhilatê Çemê Dîjleyê ye; li bakurê wê Çiyayê Ramanê heye. Heskîf, ji aliyê Çemê Dîjleyê ve hatiye çêkirin û wekî keleheke surîştî tê nûçeyê. Çiyayên ku dor li bajêr girtî ne, ji bo çûyin û hatinê jî astengên mezin dertînin. Heskîfê, di dîrokê de her dem bi vê rewşa xwe ya taybetî û cografîkaya xwe bal kişandiye ser xwe. Dîrokas û gerokên Dema Navîn (Ortaçağ) jî dema behsa Heskîfê dikin, balê dikşînin ser vê yekê.

Heskîf ji hêla pêşiyên kurdan angoyayîyan ve hatiye damezrandin. Lewre di nava bajêr de jêmayên (kalimti) ola xeyalî gelekî berbiçav in. Her wiha jêmayên olên monoteîzm û paganîzmê jî hene. Berî Zayînê, di navbera salên 1250 û 1252'yan de, pêşiyên kurdan Dewleta Mitanî li herêmê desthilatdar bû. Bi lêkolînên arkeolojîk, ku li serbajare Hîfîtiyan Hattûşaşê (Boğazköy) hatine pêkanîn, belgeyek li ser Mitanîyan jî dest ket. Li pey vê belgeyê, Mitanî, Heskîf jî di nav de, li herêmê desthilatdar bûne. Ji vê yekê jî diyar e, kurd li Heskîfê, di nava şaristaniyên pêşîn de jî digirin.

Heskîfê, ev rewnaqa xwe ji Eyyûbî û pêşiyên kurdan Merwanîyan wergirtiye. Hebûna Merwanîyan a li herêmê, di pirtûkên İbnul Ezrak ên bi navê "Tarîxûl Farqîn" û "Tarîxî Meyyafarqîn û Amedê" de jî darî çav dibe. Bi taybetî di pirtûka "Tarîxûl Farqînê" de behsa Merwanîyan tê kirin. Çavkaniyên ku qala Eyyûbîyan jî dikin hene, lê gelekî kêmtir in. Wekî din Şerefxan Bîtlîsî jî di Şerefnameyê de qala Eyyûbîyan û Heskîfê dike.

"Heskîf jî ya tirkan e!"


Li ser Heskîfê çavkaniya herî baş û berfireh "Vakayînameya Heskîfê" ye, ku îro li Pirtûkxaneyê Neteweyî ya Vîyanayê tê parastin. Ev pirtûk, gelek aliyên nediyar ronî û zelal dike.

Îro Heskîf wekî bajar tê binavkirin. Lê ev çewt e. Lewre ku Heskîf wekî "akropol" were binavkirin, bêhtir di cih de ye. Ji ber ku di dema Yewnana Antîk de ji bajarên wekî Heskîfê re, ku li cihê bilind û asê tene avakirin, "akropol" tê gotin. Ji ber vê hindê Heskîf jî akropol an jî akropolîsa Kurdistanê ye.

Heskîf, ji bajarekî bêhtir navendeke surîştî û dîrokî ye. Keleha Heskîfê li ser milekî Dîjleyê ye. Van milê Dîjleyê li her du aliyên Heskîfê du geliyên kûr pêk anîne û keleha Heskîfê li ser van du geliyên kûr bilind dibe.

Li derveyî akropolîsê, piçekî li xwarê, gelek şkeft hene. Dîroka avabûna van şkeftan heya Dema Pêşîn (İlkçağ) diçe. Hejmara van şkeftan li dora 4 an jî 5 hezarî ye. M. Streek gelek mafdar e, ku ji bo Heskîfê dibêje, "serbajare mirovê şkeftan". Dîsa li derveyî akropolîsê, li jêra gelî, jûrên (ode) zinar hene û hejmara wan jî gelek e. Li gorî jêmayan ev jûr, jûrên gelên îsawî an jî xiristîyan; ên ku dema ola xiristîyanî nû peyda bûye ne. Xiristîyan li Romayê jî jûrên bi vî rengî re dibêjin "katakomp". Lewre ev jî katakompên Kurdistanê ne.

'Serbajare Mirovê Şkeftan'




Li kelehe, di zinarên asê de bihurên veşartî hatine avakirin. Dema ku bajar tê vegirtin, gelê akropolê di van bihurên, ku bi awayekî çivangî hatine avakirin re, heya çemê dişiqite û avê hildide.

Mirov bi deriyekî abîdewî dikeve kelehe; ji vir pê ve hetanî akropolê derence hatine çêkirin. Dema mirov digihêje akropolê, Çemê Dîjle û axa Kurdistanê bi hemû bedewî û rewnaqiya xwe xuya dibe. Mirov li ber vê bergeha bêhempa şaş û metel dimîne û gelekî pê kêfxweş dibe. Dawiyê mirov dibêje: "Çawa destê wan li Heskîfê digere!"

Li kelehe, di zinarên zaxor (asê) de bihurên veşartî hatine avakirin. Dema ku bajar tê vegirtin, gelê akropolê di van bihurên, ku bi awayekî çivangî hatine avakirin re, heya çemê dişiqite û avê hildide. Her wiha Pira Heskîfê jî gelekî navdar e û di dema xwe de xwedî firehtirîn kemberê bûye. Lê kember îro hilweşiyaye.

Di nava akropolê de avahiyên ku ji dema îslamiyetê mane gelek in. Ev avahî, bi piranî ji aliyê Eyyûbîyan ve hatine çêkirin: Mizgefta Bilind (Ulu), Mizgefta El Rizk, Mizgefta Siltan Silêman, Mizgefta Beran, Mizgefta Keçikan, Mizgefta Biçûk, Zaviyeya İmam Evdila û Qesra Biçûk avahiyên Eyyûbîyan in. Li gorî İbnî Şeddad, di sedsala 13'an de Merwanîyan jî gelek avahî çêkirine, lê heta îro li ser piyan nemane. Niha jî di navbera Kercêws û Heskîfê de bi navê Merwanî gundek heye. Wekî din şaristaniyên wekî Pers, Romanî û Bizansî jî li Heskîfê desthilatdar bûne. Dîsa demekê, gelê asûrîsuryanî jî ev der kiriye navenda pîskoposî ye.

Îro dewlet tirk û zanyarên wê, dil di-



Qesra Biçûk

kin ku Heskîfê wekî jêmaya xwe bidin xuyakirin. Lê ev tişteki eletewş e, lewre dîroka wê heta Berî Zayînê sala 2000'î diçe û wê demê tirk hîna li şanoya dîrokê peyda nebûbûn. Li gorî dîroknasên tirk, Heskîf Berî Zayînê di sedsala 8'an de ji aliyê tirkên Karluk ve hatiye avakirin.

Li aliyê din bi baweriya dîroknasên tirk navê Heskîfê jî tirkî ye. Li gorî vê yekê, bi navê Hesen di kelehe de girtiyek hebûye. Ev girtî, berî ku bimire ji siltên re dibêje, "Berî ku ez bimirim, ez dixwazim bi hespê xwe, di nava kelehe

de bigerim." Sultan, destûrê dide û Hesen piştî çend tûran dadike, ji nişke ve hespê xwe ber bi misefilê (uçurum) ve diajo, tevî hespê xwe dikeve nava çem. Hesp dimire, lê Hesen rizgar dibe. Li pey vê yekê, leşkerên ku ji kelehe li bûyerê temaşê dikin dibêjin, "Hesen keyf!" ango "Hesen te çi kir?" Lewre li ser vê yekê navê vê derê bûye "Hesenkeyf". Wekî diyar e nixrandinên wisa gelekî eletewş in û bêhtir dirûvê gotegotên (riwayet) geleri bi wan dikeve.

Di sala 1935'an de arkeolog û pisporê dîroka hunerê yê frensî Albert Gabriel hate Kurdistanê û li Heskîfê li ser berhemên dîrokî, hin lêkolînên zanistî kirin. Piştî ku lêkolînên wî qediyên, ji wezîrê çandê yê Tirkiyeyê re namemek şand û got, divê berhemên dîrokî yên li Heskîfê werin parastin. Lê wezîr, ev daxwaz di ser guhê xwe re avêt.

Di sala 1967'an de rayedarên Tirkiyeyê, ji bo şeniyê di nav şketftên li Heskîfê de dijî, hin avahî lêkirin. Ev avahiyên ku li ser berhemên dîrokî hatin çêkirin, bêkêr bûn û ji bo tu pêdiviyên şeniyê nebûn bersiv. Bi vî awayî, ev berhemên dîrokî yên bêhempa dîsa hatin herimandin.

Heskîf, di sala 1987'an de di dereca yekemîn de wekî "qada sît" hate ragihandin. Di sala 1981'ê de jî ji bo 22 berhemên di nava akropolê de biryara parastinê hate girtin. Tevî van biryaran heta îro di vî warî de xebateke berbiçav nehatiye kirin.

Ji dîroka devkî pirek ji benan

Ji Dîroka Devkî

mirovên ji xaka Mezopotamya
- ku hozan û terecanên dema demê
bûn-

(di sedsala bîstan de
li ser erdê bindest)
ji her însanekî qaznaxeke vala...
her yek jê
biyaniyekî evîna şîregerm!
(dem
dem siya veşarî
ji xeyalên bo evînê re jî
bi xeyd e)

dem
gilokeye ji êgir
di destê teşîrêsên welêt de

niha
her canbazekî
împeryalîzmê
li ser doşegên berdêlî de
wekî marê di sîvengên
payizên Serhedê de
tevîzî ne

tûyên me çûne sûkê
bibîjîm dims!*

di askorên biyan de
li ber fîtîkên nener û sosret
parêznameyan li ser hişê tîrş
reş dikin
rû ji dîwarên sofî reştir

Cîhan Roj

* "Nokên me çûne bajêr bibin leblebî"

were
were ez sembolan ji te re bikim
fosîl di axa xwe de

ezê qîloçên xezalan jî ji te re bînim
ger bibe sedema mirina min jî
ez evînê bê fêda nahêlim!

Zerdeşt Nînova

Embaz

to vîrî yeno,
zaf bibi berz
riyê ezman di adirê berxwedan
zaf germin û gonî bi
ma destê xo eştibî serê kiftonê

yemno

û dormalê adirê di govend kerdibî

bikirê;

wa piro cîhan pey bi hesi rû,
roşniyak zerê welatê ma di biya
berz
rojî kû zere piro welatê ma tariyon
di

bena berz
û ew cara şoqê xo vila kena pêro
cîhan!...

e, embazê mi;
vatox to, ha mi vîrdê
ez nişkew vatox to bero ca
la belê embazonê şervano û
şoreşkero
vatê to berdo ca

Ali Mîrvan

Helbest

Hêlek min çek
yek helbest
carna çek dişuxule
carna helbest diaxive
lê helbest bi bin dikeve
çima?
ji bo çi gelo?
tiştê hêza helbestê kêma kiriyê çi ye
gelo?

ji ber ku mirovati rûreş bûye
ji ber ku serdestan
cîhan tari kiriyê
heta ku cîhan ronî be
heta Roj derkeve
wê çek bişuxule
piştî ku Roj derket
ku bindest azad bûn
wê demê dê helbest jî bi ser keve
ezê jî çekê bişkînim
helbestê bixebitînim
ji bo ku dinya bibe gulbihar
ji bo ku helbest bibe desthilatdar

Harbî Soylu

Gêrika Kulek

li welatê xerîbiyê dixebitîm
xizanî gelekî zor e
ji xwe re diponijim dilzîz im
xeyal westiyane nola min
roj diçe ber bi êvarê de
bayê rojhilat çend telepiyê ewrên sor
dane ber xwe û diçe ber bi qûntera
çiyê ve
dest qelişîne li ser destiyê bêre
gêrikek radipelikî bi bêra min ve
qirşek xistibû devê xwe, ji heval û
hogirê xwe veqetiyabû
çarenûs yek bû
qirş di destê wê, bêre di destê min de
de were negirî û nelorîne
de ji kerema dilê xwe re nenuhurîne
em mîna hev
winda kiriyê me rêka welêt û moris-
tana xwe

Fatih Bendewar



pira ji benan e)

mirovê kurd;
ji pesindariya tebaqa tûtîne
ji bin barê tîrsnakiya namûsa
bi havênê bênamûsan
havên dayî

ax û
xwîn
jan
olamtî
pelîsetî
niha tiştê şîn tê
bi ruhê teşîrêsan
rengê jînê dialêsîn

Pênc Dilop

çavên min bûne brutus
kêr li tenêtiya dilê min xist
dilokeye xwînê, xeydek ji jiyânê
her dilop, evînek e
min evînên xwe ji tenêtiyê
diguvaştin

ji min xeyidî bûn
stûxwar bûn
êdî em ne li hev bûn

ezman, çiya, stran, welat, baran
her yek sembolek bû
her yek bi eşqekê re hatibû jiyîn
bila ew ji çavên min re bêjin brutus
bila ew ji mala dilê min bar bikin
were ez sembolan bi te re bijîm

û deyirî vatibî
vengonê ma aya şew cira dirnabî
û ma yew fekira qîmaynî
ma vatî ki, ma estî û timî zî estî...
e, embazê min!
to, aya şew mira vatî bi;
destonê xo û zerê xo,
deng bikir aşm
û yew wîrdîsê roşnî tira bi tirawî!
la belê wa aşm ni veynirû
wîrdîsê xo zaf bikir pit,
wa aya roşnî to destî ra nêveciro û
nêremiro.

peyra herg hetê welatê xo ra vila
bikirî
serê koyon di,
zerê deştan di,
zerê dewanê veşnayinonî di zî vila

Şerê li Keşmîrê gur bû Hîndistan û Pakîstan gefan li hev dixwin



★ BEŞA NÛÇEYÊN DERVE

(Destpêk rûpel-1)

Kesên li ser mijarê pispore daye zanîn ku saloxên li ser vevê yekê gihîştine ber destê hêzên Hindistanê, lê wê demê, ji ber mercên giran ên hewayî û asêbûna cihên navborî, siyasatmedarên Hindistanê guh nedaye wan agahiyên. Bîlindahiya van cihên sar û bi berfê dagirtî 5 hezar metro ye.

Ji 26'ê gulana 1999'an bi vir de, Artêşa Hindistanê bi 30 hezar leşker û hêzên hewayî ketiye herêmê. Lê ji ber ku di destê şervanan de çekên giran hene û li cihên stratejîk bi cih bûne, hêzên Hindistanê nikarin van ji herêmê derxin. Çavkaniyên Hindistanê di vî warî de balê dikişînin ser alîkariya Artêşa Pakistanê ya bo şervanan. Li gorî wan çavkaniyan, ew kes ji hêla artêşa Pakistanê ve hatine perwerdekirin û li wir hatine bicihkirin. Her wiha tê îdiakirin ku ew kes ne niştêvanê Keşmîrê ne, kesên afgan û pakistanî ne.

Heta niha di şer de du balafir û firokeyeke Hindistanê ketiye. Li gorî Artêşa Hindistanê 103 leşkerên wan hatine kuştin û 242 leşker jî birîndar bûne. Heman çavkanî kuştîyên aliyê din jî wekî 267 nişan daye.

Ev herêm, ji sala 1947'an ku Pa-

kistan û Hindistan ji bin nîrê Îngilistanê derketine û ji hev veqetiyane vir de, mijara şer û pevçûnan e. Heta niha sê caran di navbera her du dewletan de şer derketiye. Şerê dawîn di sala 1971'ê pêk hatiye û di sala 1972'yan de peymanek hatiye girêdan. Bi vê peymanê, sînorê di navbera her du dewletan de diyar bûye û Xeta Kontrolê di navbera her du dewletan de hatiye danîn. Li gorî vê peymanê, ji sisiyan duduyê erdê Keşmîrê di bin destê Hindistanê de maye û ji sisiyan yekê erdê Keşmîrê jî di bin destê Pakistanê de ye. Ji ber ku piraniya gelê Keşmîrê misilman e, dewleta Pakistanê piştewaniya şervanên Keşmîrê dike. Şervanên ku doza cudabûna ji Hindistanê dikin jî, beşa di bin destê Pakistanê de wekî baregeh bi kar tînin.

Li hemberî bişûnewarbûna şervanên Keşmîrê, reaksiyona tund a Hindistanê deriyê şerekî giştî, li her du dewletên ku ji mêj ve li dijî hev in, vekir. Tiştê ku şerekî bi vî rengî xeternaktir dike jî çekên kîmyewî û nukleer ên di destê her du dewletan de ne. Her du dewletan jî sala çûyî çekên nukleer ceribandibûn. Ji niha ve rayedarên Pakistanê îdia dikin ku Artêşa Hindistanê li hemberî şervanên Keşmîrê çekên kîmyewî bi kar tîne. Lê rayedarên Hindistanê vevê yekê wekî îdiayeke bêbingeh didin xuyakirin.

Ji bo vekirina riya lihevkerinê, wezîrên karê derveyî yên her du welatan roja 12'yê pûşperê li Delhiya Nû li hev rûniştin, lê negihîştin encameke erênî. Piştî hevdîtina her du wezîran, Wezîrê Karê Derve yê Pakistanê Sartaj Azîz bi Serokwezîrê Hindistanê Vajpayee re jî hevdîtinek pêk anî.

Ji daxuyaniyên her du aliyên ên piştî hevdîtinan diyar dibe ku her du alî bi awayekî cuda li mijarê dinêrin. Bo nimûne; Pakistan dixwaze bi riya vevê bûyerê Kêşeya Keşmîrê bîne ser maseyê, lê Hindistan tiştê vî rengî napejirîne. Her wiha Pakistan şervanên Keşmîrê wekî şervanên azadiyê bi nav dike û Hindistan jî vevê yekê wekî nişaneya hevalbendiya wan û vevê dewletê dinirxîne. Wisa xuya ye ku Hindistan kesên ku ji bo cudabûna Keşmîrê têdikoşin, wekî destikê Pakistanê dibîne.

Hate ragihandin ku Serokê Amerîkayê Bill Clinton jî ji bo ku çareseriyek ji kêşeyê re bê dîtin, bi Serokwezîrê Hindistanê re, bi riya telefonê, peyiviye û xwestiye her du dewlet kêşeyên xwe bi gotûbêjan çareser bikin.

Piştî hevdîtinan her çiqas her du aliyên jî da zanîn ku dilê wan nîn e şerekî derxin, lê rayedarên her du dewletan jî aliyê din sêdar dikin. Her wiha rayedarên her du dewletan jî diyar kir ku ew ji şer re ji amade ne.

DI ÇAPEMENIYA CÎHANÊ DE KURD

Toronto Globe and Mail

REWŞA KURDAN JÎ DIŞIBE YA
KOSOVAYIYAN

Nivîskarê Rojnameya Toronto Globe and Mail Alan Freeman, di hejmara roja 11'ê pûşperê de, nivîseke berfireh li ser Kêşeya Kurd nivîsandîye. Di nivîsê de natiye daxuyandî ku li welatê kurdan jî 4 hezar gund hatine valakirin, milyonek mirov hatine koçberkirin. Freeman gotiye, kurd jî hemû mafan hatine bîparkirin û nikarin vegerin gundên xwe. Di nava nivîsê de helwesta rayedarên tirk, ku hebûna kurdan û kêşeya wan red dikin jî, hatiye rexnekirin. Nivîsê bal kişandiye ser wekheviya nêzîktêdayina dewleta tirk a li ser Kêşeya Kurd û ya Miloseviç a li ser Kêşeya Kosovayê. Her wiha durûtiya NATO'yê jî hatiye rexnekirin.

Vek

LI BER ÖCALAN CEZAYÊ ÎDAMÊ
HEYE

Rojnameya hefteyî ya rûsî Vekê li ser Doza Sedşalê nûçeyek amade kiriye. Amadekarê nûçeyê daye zanîn ku li ser biryara der barê Öcalan de, gotina tiştêkî tegez ne hêsan e, lewre Öcalan serokê tevgereke neteweyîye û siyasatmedarek e; dewleta tirk her çiqas wî wekî sêdarekî adlî bi nav bike jî, bi vî çavî li wî dinêre û xala ku jê doz hatiye vekirin jî vevê rastiye nîşan dide. Di nûçeyê de hatiye gotin ku Öcalan bi awayekî nerm nêzîkî di dozê daye û dixwaze ku ew doz, xizmetê ji doza neteweyî ya gelê kurd re bike. Rojnameya Vekê diyar kiriye ku darvekirina Öcalan gelekî dijwar e. Lewre îdam, digel reaksiyona tund a kurdan, dê bibe sedema rexneyên tund ên cîhanê jî.

Washington Post

MAFXUR SÎNORAN NAS NAKIN

Rojnameya Washington Postê, roja 16'ê pûşperê cih daye gotûbêjêke bi Rêveberê Rêxistina Eflûyê şaxa Amerîkayê William F. Schulz re. Di vevê nivîsê de Schulz daye zanîn ku li welatên wekî Çîn, Kûba û Sûdanê mirovan ziyaneke mezin dîtiye, lê dewletên ku xwedêgiravî parêzgeriya mafên mirovan dikin, çavên xwe ji van tiştan re digirin. Di nûçeyê de hatiye gotin ku li Tirkiyeyê li hemberî kurdan mafxuriyên girîng pêk tên; li Amerîkayê darvekirin, li Îsraîlê jî îşkence heye. Rêveberê Al'yê xwestiye ku dadgeheke mafên mirovan bê avakirin û kesên mafxur û zilimkar bîndarizandin.

Ji herêmên Amed û Botan, kilamine ji hesreta dilan

Heyla delal tu delal î

Lawikê Delal

Heyla delal, heyla delal, heyla delal
lawkê delal

Ezê bi Şirnexa xopan diketim
Were dayê rebenê qala girî
Weyla gawirê gawirbabê
Minê dên û bala xwe dayê
Minê digot binya Şirnexa rengîn
Du zerî esmerê rûniştin
Belê ji kula dilê min û te re
Qelen û nextê xwe dibirîn

Heyla delal, heyla delal, heyla delal
lawkê delal

Belê vûrû min xanî kir ser xaniya
Heyla gawirê gawirbabê
Ezê derketim ser hewaleyî banê bilind
Jor de min ê meze kir dawetê
Belê gewra min î kofî sipiya
Heke ezê rojê sê caran
Çavê xwe vî heramê dêrisê gunda
Digerînim nagerînim
Ezê bejn û bala bilind û zirav nabînim
Wek berf û bala serê Çiyayê Cûdî
Tava temûz û tebxê lê dide
Noqte noqte, belê ciger û meleka dilê min
heliya

Heyla delal, heyla delal, heyla delal
Bejn zirav gula dilê gundê me ye
Were Xwedê hezar carî ava bivê
Qederê pênsed malî tê de heye
Wele wextê riye çavê min
Ji wê bejn û bala te nakevê
Wile heçku teva mala xwe
Barkirî kavle
Wele sebra minê xirabe ye

Heyla delal, heyla delal, heyla delal
Bejna zirav
Ezê li Şirnexa şewitî ketim
Werê lê gawirê çî xweş war e
Were ji kula dilê min û te re
Binre deşt e lê sere çiyay ye
Wextê rojê çavê min
Li wê bejn û bala te nakeve
Heçku ava Çemê Botan li min çikyaye

Heyla delal, heyla delal, heyla delal
Lawikê delal
Sibeye tavê dêrisê gundê we zeriqand
de vê zalim qîza zalima
Çawa rûnişt her ber kulek û pencere
eynikan
Were dayê rebenê xwe xemiland
Hey gawirê, Xwedê mala babê te xira
bike
De çîqa merê xwe dilê xwe kir
Wile te ceğer û dil û melaka
Dilê min heliyand

Heyla delal, heyla delal, heyla delal
Lawikê delal
Wile berfê lêkir, berfa bêra
Hey bê mirada Xwedê
Minê digot bayekî jorde lêda

Belê ji kula dilê min û te re kirye sebra
Wile ezê rabim vê sibê
Qulf û mihta ser sing û beriva bedena
Xwe evdala Xwedê venakim
Ezê bihêlim ji delalê dilê xwe re
Belê heta bêyo ji rêka dêra

Gewra min

Were gewra min rinda min
Berfa çiya li min heliya
Wile ez evdalê Xwedê
Bûme pîr û bedewa
Ketime serê riya
Wile wextê rojê
Sê caran çavê min
Li wê bejn û bala te dikeve
Belê dilop dilop
Ezê can û cigera xwe de heliyam
Ax gewra min tu dîn î tu dîn î
Were rinda min tu dîn î tu dîn î

Were gewra min rinda min
Malê me bar kirin qet dananîn
Lêlê li Zozanê Serhedê
Dewsa war û bara danî
Belê sed car qewl û qerar bext nema
Lêlê ji qîz û xortê vî zemanî
Ax gewra min tu dîn î tu dîn î
De gewra min tu dîn î, tu dîn î

Were gewra min rinda min
Minê digot bihar e xweş bihar e
Belê malê me bar kirin
Danîn serê Zozanê Serhedê
Lê dewsa warî bar e.
Lê belê sing û bera bedenê te



Evdala Xwedê, sala par vî çaxî
Wê ber destê min bû
Belê minê ditû sala îsal
Ketiye ber destê vî kûtêke goriyê beranê
mêrê kal e
Ax gewra min tu dîn î tu dîn î
De rinda min tu dîn î tu dîn î

Were gewra min rinda min
Ezê diyarî xopana Herekola Mîra diketim
di kula dilê min û te re be keviya
Wile Xwedê dizane ji êvara Xwedê ve
Tu çend caran derê mala me re diçûya
Wile wextê rojê çavê min
Li wê bejn û bala te nakeve
Wile dilop dilop
Can û kezeba dilê min heliya
Were gewra min tu dîn î tu dîn î
De rinda min tu dîn î, tu dîn î.

HERÊM: BOTAN
BERHEVKAR: KAZIM EKINCI

DELALO TU DELAL Î

De sê roj çûye ji meha payiza di ortê ye
Cima navê fitika delalê min derketiye ji qereqolê, gidvano law ji şubê ye
De berê delalê dilê min dane dikanê berberxanê
Tûncika delalê dilê min avêtine ber meqesê, gidvano lo ber cûzanê ye

Delalê dilê min birin hemamê hemamîş kirin
Qata cilê nîzamiyê girtin li delalê dilê min dikirin
Delalo delalo delalo delalo delalo delalo delalo delalo delal delalo tu delal î

Delalê dilê min birin îstasyona şewitî ber tirênê
Wele xurîn diketin vê xopanê vê mîrata vê tirênê
Minê porkura Xwedê gava bala xwe didayê
Delalê dilê min nexwanê ye ji mijê ji dûmanê
Delalo delalo delalo delalo delalo delalo delalo delalo delal delalo tu delal î

De delalê dilê min hanîne îstasyona Diyarbekir peya kirin
Qata cilê nîzamiyê girtin li delalê dilê min deşîş kirin
Meqesê vê çîpanê vê xopanê vê mîrata tirênê deşîş kirin
Delalê dilê min li wê derê siwar kirin, birin topraxê Anadolê li Selîm Qîşlê peya
kirin
Delalo delalo delalo delalo delalo delal o delal o delal o delal delalo tu delal î

De delalê dilê min birin Stembola xopan li Selîm Qîşlê peya kirin
Qata cilê nîzamiyê li delalê dilê min deşîş kirin
Delalê dilê min birne telîmxanê telîm kirin
Delalo delalo delalo delalo delalo delalo delalo delalo delal delalo tu delal î

Xwezila wezê bibama çivîkek ji van çivîkên ber ezmana
Ji xwe ra bigeryama li Anadolê, li şaristana
Minê bidiyana mektûba delalê dilê min ji hudûdê Bulxar bihatana
Ca bigota delalê dilê te bûye çawîşê ser borîzana
Delalo delalo delalo delalo delalo delalo delalo delalo delal delalo tu delal î

De delalê dilê min birine Stembola şewitî gidî li ber çem e
Minê porkura Xwedê gava bala xwe didanê ecemiye nizane pate bavê were cem
e
De hay delalo delalo delalo delalo delalo delalo delalo delal delalo tu delal î

HERÊM: AMED
BERHEVKAR: G.DÊRSILÊ

Manîfestoya Aştîyê

Wêşanxaneya Memê parastina Serokê Giştî yê PKKê Abdullah Öcalan bi navê "Kürt Sorununda Demokratik Çözüm Bildirgesi" (Di Kêşeya Kurd de Danezana Çareseriya Demokratîk) wekî pirtûk weşand. Di despêka pirtûkê de Serokê PKK'ê hitabî dadgeran dîke û dibêje: "Tu şer û pevçûnên dijwar bêyî bidestxistina aştiyê azad bi dawî nebûne. Ji destê kê çî were, divê teksîr neke."

Di pirtûkê de an di parastina Doza Sedşalê de Öcalan, tekiliyên tirk û kurdan, pevajoja peydabûna PKK'ê, pirs-girêkên xweguhertinê yên di nav PKK'ê de, tezên ji bo yekîtiya demokratîk, rola kurdan a di damezirandina Komara Tirk de, di Kêşeya Kurd de pêvajoya nû û gelek mijarên din ên li ser tirk û kurdan, xal bi xal analîz kiriye.

Öcalan, di parastina xwe de diyar dîke ku ew bi aliyê hiqûqî re elqedar nabe û dide zanîn ku parastina wî divê wekî bersiva doznameya (iddianame) dozger neyê famkirin. Li gorî Öcalan, ev yek ji bo aştiyê, demokrasiyê û biratiya gelan îmkân û fersendeke mezin e. Bi rûmet e. Dîsa mirov dikare parastina Öcalan ji aliyê agahiyên li ser dîroka Komara Tirk ve, wekî çavkaniyê heja bibîne.

Yek ji xalên herî girîng jî mijara qedexekirina zimanê kurdî ye. Abdullah Öcalan wiha dibêje: "Hem tu yê bêjî tu

ji bo Komarê endamê avakar î, hem ji tê zimanê wî qedexe bikî. Bi van taktîkan tu dev ji çareseriyê berdî, kêşeyê diwartir û kurtir dîke, pirs-girêkên civakî girantir dîke û mirovan dide ser rîya çalakîyên herî dijwar."

Öcalan dide zanîn ku siyaseta aştiyê ne îro dest pê kiriye. Vê yekê, ji dema Turgut Özal ve dest pê kiriye. Öcalan nêzîktêdayina PKK'ê ya wê demê wiha formule dîke: "Em nabêjin ji nişka ve em dê ji Tirkiyeyê biqetin". Herwiha diyar dîke ku ew di vî mijarê de gelekî birasteqînî difikirin.

Di nav rûpelên pirtûkê de di beşa "Demokrasi: Di sedşala 20'an de bi ser dîkeve (20. yüzyılda zafer kazanan demokrasi) de Abdullah Öcalan li ser dîroka demokrasiyê, pêvajoyên demokratîk, salên sazîbûna demokrasiyê ya li cihanê, bandora wê ya li ser Tirkiyeyê

û kurdan rawestiyaye. Öcalan li ser vî mijarê dîtmen xwe wiha tîne zimên: "Demokrasiyê li dijî dîktatoriyan faşîst û reel-sosyalîzmê serkeftina xwe îlan kiriye. Her du sistemen totalîter jî di destpêkê de mirovan gelekî bi pêş dixin. Lê, li ser piyan bi domdarî namînin. Ev yek jî ji ber çewsandina van sisteman a li ser şarezatiya afirîner, mirov û civakê pêk tê. Demokrasi mirovan hêdî hêdî bi pêş dixe. Lê zû bi zû narûxîna û nakeve."

Abdullah Öcalan di beşa "Tezên ji bo yekîtiya demokratîk" de li ser yekîtiya tirk û kurdan dîsekinê, ji aliyê dîrokî û siyasî ve peyva KURDISTAN'ê dinirxîne û diyar dîke ku peyva Kurdistanê hem ji aliyê Siltanê Selçûkiyan Sancar, hem jî ji aliyê M.Kemal Atatürk ve hatiye bikaranîn û qet nikare bê qedexekirin. Li gorî Öcalan Misaki-Milli jî sonda tirk û kurdan e. Serokê PKK'ê di parastina xwe de car

caran jî Atatürk minakînan jî pêşkêş dîke û dide zanîn ku di şertên îroyîn de li ser esasê Komara Demokratîk meşa bi hev re, li ser bîngeha wekhevîyê, daxwaza her kadroyê Teverga Azadiyê ye û ji ber vî yekê ye ku ew bêtirs van dîtinan diparêze, bi pêş dixe.

Di parastinê de Öcalan, beşek ji talîmata Atatürk a ku di sala 1920'an de ji fermanarê El-Cezîrê Nihat Paşa re şandiye pêşkêş dîke. Di talîmatê de Atatürk jî fermanarê herêmê dixwaze ku kurd û bîyanî (îngilîz, fransîz û hwd.) nebin yek û ji aliyê îdarî ve rayeya herêmê dide femandariya El-Cezîrheyê.

Di parastinê de li ser azadiya ziman û çanda kurdî bi taybetî hatiye rawestîn. Li gorî Öcalan, rîya çareseriya Kêşeya Kurd, piştî hin gavên cesûr, di azadî û geşbûna ziman û çanda kurdî re derbas dibe. Her wiha dewletê jî ev yek fam kiriye û di 93'yan de ne bes be jî azadiyê qismî nas kiriye. Öcalan dibêje: "Li tu deverên cihanê li ser zimanê zîkmakî qedexekirin tune ye, divê li Tirkiyeyê jî tune be."


Mirov dikare bibêje ev pirtûk an jî parastina Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, di famkirina pêvajoya siyasî û stratejiyên pêşeroja kurdan de dê cihekî gelekî girîng bigire.

SERWISA ÇANDÊ



Mîtolojî

HASAN KAYA



Di zimanê grekî yê kevn de sê wateyên gotin an jî peyvê hebûnê. Yek jê mytos, yek epos a din jî logos bûye. Mytos gotina ku hatiye gotin an jî bihîstin e. Di wateya şorê, çirçîrokê, çîrok û efsaneyê de hatiye bikaranîn. Bawerî bi mytosê nayê. Lewre dema ku mirov tiştê ku hatiye serê wan vedibêjin, hinekî mezin dikin. Ango hinek derewan bi ser ve dikin û dixemilînin.

Efsaneyên hemû gelan hene, lê bêtir grekan qedrê wan zanibûyê û hezaran sal berê nivîsîne. Ji ber ku hatine nivîsandin nemir bûne û hemû kelepora grekan ji van mîtan ango efsaneyan sîd wegirtiye.

Mixabin di vî babetê de jî em kurd di sinifa xwe de mane. Her çiqas em zêde pesnê xwe bidin û em bibêjin kurd wiha wiha zengîn in, ji aliyê mîtolojîyê ve, lê mixabin heta niha ez pir kêr rastî mîten kurdan

hatim. Dibe ku beriya hezar salan an jî sed salan em ji aliyê wan ve zengîn bin lê ku îro di destên me de nebin û em ji wan sîdê wernegirin, ma çî tama wan heye.

Mît bi piranî di heqê afirandinê de ne. Li nik me yên ku ez bi wan dizanim, yên di heqê afirandina leglegê, pepûkê, rivêz û hwd. ne. Di heqê afirandina kurdan de jî çend mît hene. Yek ji wan heçku ji bo rewşa me ya niha hatiye vegotin.

Dibêjin Adem û Hewa li hev rûniştine û ketine qirika hev. Adem dibêje zarok heqê min in. Hewa dibêje na keda mezin a min e, di afirandinê de para mezin a min e. Dibêjin; nexwe ka bila her yek ji me ava xwe têxe qutiyeke, emê piştî neh mehan vekin. Wê demê dê bête zanîn ka di çêkirina zarokan de rol a kê ye. Wisa dikin. Neh mehên wan diqedin. Pêşî qutiya Hewa vedikin. Lê dinêrin ku bêhneke sosret pê ketiye. Qutiye diavêjin Çemê Dicle. Ji bo ku qutî here Okyanûsa Hindê. Wê demê Korfeza Basrayê tune bûye. Qutî digihêje wî cihê ku niha Korfeza Basrayê ye; li wir diteqe, dibêjin ji wê teqînê, Korfeza Basrayê hatiye afirandin.

Qutiya Adem vedikin, lê dinêrin ku kurekî û keçeke pir bedew çêbûne. Li gorî mîtolojîyê, kurd ji wan zarokên Adem in. Cîhana

ku mayîye jî ji zarokên Hewa çêbûne. Yanî kurd ji neslê Adem in. Lê ne ji neslê Hewa ne. Piştî ku ev zarok mezin dibin û ew jî dibîne xwedî zarok, Adem wan li hev dicivîne û dibêje, lawo xwe ji zarokên Hewa biparêzin.

Zuriyeta Hewa dê ya nemayî bîne serê we. Xelasiya we ji destê zarokên Hewayê nîne. Ji ber vî yekê xwe bispêrine çiyayên welatê xwe.


Tê gotin ku ji wê rojê ve kurdan çiya ji xwe re kirin war û wargeh. Îro jî hinek caran, li civata ku jarî û bêxwedîtiya kurdan tê rojevê, hinek mirov dibêjin, "Heyran hêviyê ji zaroyên Hewa nekin. Xêra wan ji me re nîne. Ji xwe hêza me zaroyên Adem jî evqas e". Hinek jî dibêjin ji ber wê şîreta Adem e ku bav û kalên me gotine, "Dema ku tu ketî tengasiyê, yan xwe li mîrekî çê, yan xwe li çiyayekî asê bigire."

Helbet mît nikarin ji rewşa kurdan a îroyîn re bibîne rêber. Em nikarin mîna tirkan bibêjin, "Ji tirkan pê ve tu dostên tirkan nîn in." Bêyî civaka pêşverû ya cihanê û hêzên pêşverû yên Tirkiyê serkeftin û bi destxistina mafekî ji bo me zehmet e. Lê herî baş hatiye fêmkirin ku heta piraniya kurdan, tevî kurdên xwedî kêmasî jî hêza xwe nekin yek, emê li ber destên nekes û netîştikan bin....

Ez Adil im Adilê Bavê Tûjo me

Sê heb surguci rojekê bi komek gerîla re revî çalakiya rêbirînê dibin. Dî çalakiyê de kêminê davêjin ber korvoya teşkeran. Dî wê kêminê de çenê tîmên taybet dimirin û çend heb jî direvin. Dî nav zilamên Surguciyê de yekî bi navê Adil tîmên ku direvin dibîne û dide pey wan û bang li tîmên taybet dike. dibêje: "Ez Adil im, Adilê bavê Tûjo me. Kes nikare ji min bireve." Lê belê ew nikare yekî jî ji wan bigire.

Piştî çalakiyê Adil leşker jî bir kirine. Lê leşkeran Adil jî bir nekiriye. Rojekê tîmên taybet tîmê Surguciyê û li Adil dipirsin Dora mala Adil digirin lê Adil di pencereya piştî malê re direve. Xwe digihîne bin gund. Lê leşkeran dora gund girtiye. Adil baz dide nav kevîran, li wir li cihêkî ku xuya bike şewqeya xwe û caketê xwe derdixe dide ser kevîran û diçe. Leşker dibêjin qey Adil e, şewqe û kincên wî didin ber guleyan û wekî seradê qul dikin. Piştî re mêze dikin ku Adil nîn e. Li wir tenê şewqe û kincên bavê Tûjo hene. Wê gavê dengê ji dûrê û dibêje: "Ez Adil im Adilê bavê Tûjo me. Kes nikare min



zeft bike."

Erdal li ku ye

Li hêla Stewrê di sala 1990'î de fermanerekî gerîla yê bi navê Erdal bi nav û deng bû. Ji bo vê yekê jî leşkerên tirk li her cihê lê digerin.

Dîsa rojekê leşkerên tirk dibihîsin Erdal li herêma Surguciyê ye. Leşker

diherin Surguciyê. Hinek gundî li ber çalêkê sekinîne û dixavînin. Leşker dorê li gundiyan digirin û ji wan dipirsin: "We Erdal ditiye?"

Gundiyekek bersivê dide: "Erdal li Enqerê li meclîsê ye."

Serleşker diqehire û ji leşkerê xwe re dibêje: "Gundiyan bavêjin çalê." Gava gundî gerdibin çalê, serleşkerê

tirk dîsa dibêje: "Ji çalê derên" Gava gundî dixwazin ji çalê derên serleşkerê tirk dîsa dibêje: "Erdal li ku ye?"

Gundiyekekî din bersivê dide: "We leh qomitan beg em du Erdalan nas dikin. Yek jê li meclîsê ye û yek jî dîne gundê me ye. Li qisûra me mêze neke. me nedizanibû hûn qala dîne gundê me dikin."

Ev kerê kê ye derketiye ser xaniyê min

Rojekê surguciyek der tê serê xaniyê xwe, dixwaze xwe gundor bike. Bi panya sola xwe ya mezin û bilmê dest bi gundorkirinê dike. Piştî ku serê xanî hemî gundor dike paşê li piştî xwe difetile û dinihêre. Gava li piştî xwe dinihêre şopa sola xwe ya ku çûye û hatiye dibîne lê fêhm nake çu ye. Çavên wî beloq dibin û bi hêrs dest bi çêra dike. Wiha dibêje: "Ev kerê kê derxistiye ser xaniyê min. Ê kerê xwe derxistiya ser xaniyê min ezê di diya wî..... xwediyê wî kî ye bira ji min re derê."


BERHEVKAR: YAHYA KANDEMIR

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (177)


XAÇEPIRSA

S	B	H	A	A					
B	E	H	E	L	W	E	S	T	
R	O	M	E	T	A	M	I	N	
T	I	R	E	J	S	E	M		
F	E	R	A	T	E	A	L	A	N
S	W	T	K	E	Z	E	N	E	
A	C	V	A	P					
K	N	K	A	G	I	R			
L	I	J	N	E	A				
V	I	N	I	R	A	N			



Bersiva Xaçepirsa 175'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me. em dê wan binirxînin û bi rîya peşkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 177'an Pirtûka Weşanxaneyê Mem' Parêznameya A. Öcalan'ê.




Jêrenot:


Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata hejmara 175'an Pirtûka 'Xewna Avê' qezenc kirine ev in: Rakîp Selcuk/ Gebze, Welat Roj/ İzmir, Lîcelî Mehmûd/ Mêrdîn, Veysel Yigîr/ Semsûr, Beran Dal/ Êlih.

Qirêj Amadekar ê Ronahi- yê (wêne)	Cinavkek Cûmle	Televîzyon a kurdan Daneki rojê	Dengdare n kakil Sembola argone	Lawîrek Qeyd	Zede bi şekir
					1
Cinavkek Girar		Dengdare n sêve Sofêr	Zaravayek kurdî Penaseke olî		
			Leqabekî Yılmaz Güney	Tîpa dû kîye	Banêşane k
Tav Gihaneke		Eşîreke kurdan Xwarineki kurdan			
4	Dernek Kese ji Botanê			Netir Navekî mêran	3
Tipek Kovareke kurdî ya kevn	Derd, kul Xwarina sereke				
		5	8	Vexwarina sereke	
Dijwateya ronî			Parkitek Sembola oksijenê		
Rengêk					
6		Sewaleki fenek			



PEYVA VEŞARÎ



MEM KAYA

BÊJING



Kilm Kilm

UCA BÎ PARLENERÊ EWROPA

Weçinayinê Parlemtoya Ewropa 13'ê menga pûşper de viraziya. Peyniya weçinayin de keynaya kurd Felek-nas Uca listeyê Partiya Sosyalizma Demokratîk a Almanya ra weçinyê û bî parlemntera kurd a verîna parlemnto-ya Ewropa. Keynaya kurd û parlemntera Ewropa ya newî Felek-nas Uca weçinayin peyra weçinayoxanê xo rê spas kerd û vat: "Ezo parlamentoya Ewropa de bibî vengê şarê xo". Felek-nas Uca wast ke hemû xortê kurdan nezdî ra û bi aktif polîtika ra alaquadar bibê.

Kişt a bîna weçinayinê parlemnto-ya Ewropa ra koma demokratê Xirîstiyanan rayê xo kerdî vêşî û amorê parlemnteranê xo 201 ra vet 225. Weçinayino ke 15 welatê ke girêdiyayê jûwîna Ewropayê de virazyay de sosyalîstan û sosyal demokratan nêşa hendê weçinayinê verînî jî ray bigirê. Amorê koma sosyalîstan 214 ra kewt 180. Komînistan jî zey Xirîstiyanan rayê xo kerdî vêşî û amorê parlemnteranê xo 34 ra vet 40 parlemnteran. Koma Liberal amorê parlemnteran 42 vet 48 Koma Keskan jî 27 ra vet 38 û Koma Nijatperestan jî bî wayirê 29 parlemnteran. 626 endamê Parlemnto-ya Ewropa estê. Goreyê amorê welatê ke girêdyayeyê Jûwîna Ewropa wina biyê vila. Almanya 99 Brîtanya, Îtalya û Fransa 87, Îspanya 64, Holanda 31, Belçika, Yewnanîstan û Portekîz 25, Swed 22, Avûsturya 21, Fîlandiya û Danîmarka 16, Îrlanda 15 û Luksemburg jî 6 heb. Goreyê qanûnanê Juwîna Ewropa endamê newey bigeyriyê jî amorê parlemntaranano 700 meravêro.



MBEKÎ BI SEROKDEWLETÊ AFRIKAYA BAŞÛR

Serokdewletê Afrîkaya Başûr o newe Thabo Mbekî 16'ê meng de siwend wend û bi serokdewletê didiyinê Afrîkaya Başûr o siya. Serokdewletê verîn Nelson Mandela yo ke 27 serê xo zîndan de ravêrnayê, badê merasimê siwendwendin Thabo Mbemkî bi destê xo ya, o berd kursiyê serokdewletîn de roşayna û ci rê serkewtin wast. Ze ke yeno zanayin Serokdewletê Afrîkaya Başûr û Serokê Kongreyê Neteweyî yê Afrîka (ANC) yo verîn Nelson Mandelê Serokînê ANC jî dewrê Thabo Mbekî kerd bi. Weçinayino ke 2'yê na meng de ANC rayê % 64 girotina vêşiyê parlemnto-ya Afrîkaya Başûr vist xo dest û peyra jî serokdewletîn rê zey namzet Thabo Mbekî mûsna, vera Mbekî kes nêvejiya coka parlemnto de qandê serodewlet weçinayin nêvirazyay, tenya qandê sewendwendin merasim viraziya. Weçinayino demokratîk û azad 26'ê menga avrêla 1994 de viraziyayina peyniya nijadperstîn û serdestîna sipiyana amebi.

ÎMRALÎ RA XEBER ESTA

Öcalan: Hinî kes nêşeno verniya qezenckerdin bigiro

MEMED DREWS
(e.mail:mehmet@welat.com)

Serokê Giştî yê PKK û Serokê Rûmetinê KNK Abdullah Öcalano Girawê Îmralî de rojê 23'ê menga pûşpera 1999 paweno. No maben de jî parastina xo keno hedire. Goreyê vatena abûkatanê Öcalanî ra Niyazî Bulganî Öcalanî parastinê xo kerdo hedire. Öcalan parastina xo de persanê "Meseleya Kurd raya siyasiya çareser bibo Tirkiye çiçi qezenc kena?" û Meseleya Kurd raya siyasiya çareser nêbo û zey hetanî nika şer de israr bikiro, Tirkiye çiçi kena vinî?" sero vindarto.

Abûkat Bulganî vat ke, kes şeno parastina Öcalanî zey cewabê nê di (2)persan û herakerdinê parastinê verîn bihesibno. Ze ke yeno zanayin Öcalan parastina xo ya verîn de projeyê Cumhuriyetê Demokratîk ardbi ziwana û wastbi ke dewlet gam çekiro. Goreyê vatena abûkatê ci, Öcalano nika projeyo ke verî ardbi ziwana, ey qal qal hera bikiro.

Abûkat Bulganî pêdiyin û şertanê hedrekerdin ser vardayin û zordayinê dewlet ardî ziwana û wina vat: "Bi rastî şertê asgarî çinyê. Çi ke mayê nêşenê Öcalaniya rehat pêdiyin virazê. Hefte de, di finî (ray) û her fin jî di seati û nê di seati jî kontrolê dewlet bin de pêdiyin viraziyenê. Ne mayê şemi tevayê bidim Öcalanî û ne jî oyo şeno tevayê bido.

Rewşê winayinî de bêguman, parastinê hedrekerdin zor o. Feqet ancîna mayê parastinê xo hedire bikim. Ancî nînan het heveyê belgeyê estê, lazim o ke ma nînan bidim Öcalanî, dewleta nînan qebûl nêkena. Tabî rewşê ma zey Öcalanî niyo, qe nêbo hetê belgeyana. Ma kamîn belge biwazim şemi bivînim. Feqet rewşê Öcalanî zey ma abûkatan niyo".

Abûkatê Öcalanî Bulganî vat ke, rewşo ke Öcalan o ewro tede, zewbî kes biyayê, viradê hedrekerdina parastin, destê ci (pênûs) qelem nêtepiştê. Feqet Öcalanî, îmkananê hend tengan miyan de, projeyê kerd hedire û wast ke meseleya kurd rê çareyekê bivîno. Tirkiye jî meseleyan ra bixelsino.

Ancî abûkat Niyazî Bulganî rew qed-inayinê mehkema wastenê dewlet rexne kerd û da zanayin ke mehkemeya Öcalanî lazim o ke 5 serî biramo. Çi ke mehkemeya Öcalanî karê 2030 rojan niya. Mehkemeya ke 2030 rojan miyan de biqediyoyê jî jew nameyê ay beno mehkema zewbî cayê ci mehkema nêmaneno. Mahnaya "Doza Sesere" vaten jî tiyayê mehkema yo. Goreyê vatena abûkatê Öcalanî Bulganî, dewleta rojnameyê Sabah û Hüriyetê tirkan jew roj herey biterno jî dana Öcalanî û zey verî xeberanê aktüelan û siyasiyan nêbir- nena.

Miyan û çorşmeyê parastina abûkatan ser jî, abûkatanê Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî ra Mahmut Şakarî vat ke, iyê hetê hiqûqî ser vêşî mevindirê, bi

giranî hetê siyasi û tarixî ser ro vindirê. Abûkat Şakarî da zanayin ke iyê verniya milad ra bikewê miyan û hetanî rojê ewroyin bêrê. Bi taybetî jî nê wextî miyan de tekiliyanê şarê kurd û tirk. Goreyê vatena Şakarî ihtimal esto ke rojê qediyayinê mehkema hetanî serê na meng jî biramo.

Kişt a bîna goreyê vatenanê abûkatanê Öcalanî, ey vato ke, wa kes xem mekiro, hinî ez vinî bikirî û ez çinêbê jî şarê kurd qezenc kerd o û qe keso jî meşo verniya na qezenckerdin bigiro. Ancî Öcalanî Doza Sesere qandê çareserkerdin zey firsendekê hesibnayo û vato ke, dewletê ke tepşiyayina ey de rol girotê hetê na mehkema yê. Öcalanî şer de israr kerdin jî rexne kerdo û wina vat: "ÿyê ke ewro rantê şerî wenê, nêwazenê şer biqediyoyê. Lazim o ke aştiwazî riyê nê kesan vejê werte û verniya aşti akirê.

Gel dîxwaze em rast bin

Serokê Belediyeya Asarlıkê İzmirê Raşit Gülerüz:

Pîştî hîlbijartinên 18'ê avrêlê, HADEP'ê tevî bîdestxistina belediyeyên herêmê, bi bîdestxistina çend belediyeyên metropolên Tirkîyeyê jî balê kişand ser xwe. Yek ji van herêmên tirk ku HADEP'ê belediyeya wê bi dest xistiye beldeya Asarlıkê ku li ser navçeya İzmirê ye. Em hevpeyvîna li gel Serokê Belediyeya Asarlıkê Raşit Gülerüz ku bi Nûnerê me yê İzmirê re kiriye pêşkêşî we xwendevanan dikin.

Serokê birêz, hûn di hîlbijartinan de bi giştî rewşa İzmirê û bi taybetî jî rewşa Asarlıkê çawa dinirxînin?

✓ Wekî tê zanîn HADEP li İzmirê

wekî her car îcar jî serê gelê me yê li Asarlıkê tevlihev kir. Ji ANAP'ê bigire heta CHP'ê tim propagandayeke li dijî partiya me dihate dikirin. Lê li hemberî van listikan partiya me HADEP'ê li Asarlık'ê bi ser ket.

We bi hejmar û ferqe çawa serokatiya belediyeyê stand?

✓ Jimareya hîlbijêrên Asarlıkê 8200 e. Ji vê hejmarê dengên pejirandî 6200 e û me ji van dengên 2245 heb stand. Di navbera me û partiya duyemîn de 748; di navbera me û partiya sêyemîn de jî 1050 deng ferq hebû. Em dikarin bibêjin ku me bi rêjeya ji % 35.5 serokatiya belediyeyê stand.

Jimareya hîlbijêrên Asarlıkê 8200 e. Ji vê hejmarê dengên pejirandî 6200 e û me ji van dengên 2245 heb stand. Di navbera me û partiya duyemîn de 748; di navbera me û partiya sêyemîn de jî 1050 deng ferq hebû. Em dikarin bibêjin ku me bi rêjeya ji % 35.5 serokatiya belediyeyê stand.

bazirganekî pêz bi xwe jî heye. Mixabin li vê derê ne hesab û ne jî kitêb hatiye girtin.

Heta îro deynê me li dora 250 milyarî bû, ango me wisa dizanibû. Lê ev du rojin em pê hesiyar ku 100 milyarê din deynê me heye. Serokê Belediyeyê yê berê li derve gotiye ku wî belediye bê

Nifûsa Asarlıkê bi awayê fermî 14 hezar e. Lê niha 20 hezar kes li vê beldeyê dijîn. Dema em hatin ser kar 120 kes li belediyeyê wekî karker dixebitîn. Li hêla din 60 hezar kes li navçeya Çiğliyê dijîn û bi tenê 60 kes li belediyeyê kar dikin. Serokê berê yê belediyeyê beriya hîlbijartinan bi çend rojan bi dehan kes hildane kar. Jixwe hatina (bûtçe) belediyeya me biçire, nikare meaşa 30 kesî bide. Lewre 30 kesê ku pişt re hildabûne kar, me ji kar avêtin.

Gel bi çi awayî nêzikiyê di belediyeyê dide. Çi ji we dixwazin, hûnê bikaribin ji xwestekên wan re bibin bersiv?

✓ Gelê Asarlıkê rêveberiyeye dadyane ji me dixwaze. Jixwe em jî di vî warî de jixwe bawer in. Gel di xwaze ku em li hemberî wan rast bin. Ji rewşa belediyeyê jî haydar in. Bi rewşa heyî encax em dikarin di 3 salan de deynên xwe bidin.


Hûn dixwazin berî her tiştî çi bikin. Plan û projeyên we yê çawa hene?

✓ Di demeke kin de mirov nikare tiştêkî berbiçav bike. Vê gavê belediyeyê di bin deynan de fetisiye. 350 milyar deyn ji bo me ne hêsan e. Hatina belediyê sê salan hewqas nake. Lê li hemberî vê yekê jî dîsa hinek projeyên me hene. Di destpêkê de em dê li ser xebatên çand û hunerî bisekinin. Ji bo ciwanên xwendekar rojên şemî û yekşeman wê qûrsên taybet bêne destpêkirin. Di aliyê aborî de em dê ji xwendekaran re bibin alîkar. Her wiha ji bo paqijkirina derdorê çî ji destê me were, em texpîr nakin.

Birêz Gülerüz, wekî gotina dawî hûn dixwazin çi bibêjin?

✓ Em dê Asarlıkê li gorî îmkanan bi gel ve bi rê ve bibin.

DAVUT ÖZALP / İZMİR



Raşit Gülerüz

□ Raşit

Gülerüz, di sala 1956'an de li Erzeromê ji dayîk bûye. Ji sala 1990'î û vir de li İzmirê jiyana xwe wekî koçber didomîne. Bi salan e ku karê ticariyê dike. Ev çend sale ku Li HADEP'a İzmirê û navçeyên wê de wekî endam û rêveber kar û barê siyâsî dimeşîne.

xwedî girseyeke mezin e. Lê mixabin bi qasî ku me hêvî dikir, me deng negirtin. Ez dixwazim li ser wê yekê çend tiştan bibêjim. Li gorî fikra min, di xebatên hîlbijartinê de kêmasiya me nebûna kadroyan bû. Ji ber ku li Asarlıkê me ev kêmasî ji holê rakiribû, em bi ser ketin. Li hêla din, girseya me bi piranî kesên ku ji herêmê koçî vê derê bûne. Ev kes ji hêla aborî ve gelekî tengasiyê dikîşînin. Berî her tiştî koçberên me dixwazin ji xizaniyê xilas bibin. Partiyên pergalê

Em bawer in wekî tevahiya belediyeyên ku HADEP'ê bi dest xistine belediyeya we jî xwedî deynên giran e. Dîsa li gorî saloxdayînan serokê kevin berî hîlbijartinê ji bo ku dîsa serokatiyê bistîne gelek kes hildane kar. Hûnê li ser van tiştan çi bibêjin?

✓ Rast e. Belediyeya me heta îro wekî saziyeke kamûyê nehatiye birêvebirin. Bi rastî ez jî nikarim rewşa heyî rave bikim. Hesab û kitêbê

deyn teslîm kiriye. Lê heta îro nehatiye ku merasîma dewirteslîma belediyeyê jî. Mohreke belediyeyê jî bi xwe re biriye û ew teslîmî me nekiriye. Li gorî faturayên deyna di nava van herdu mehên dawî de bihayê 7 milyarê çaqil kiriye, dîsa ew qas qedêr jî çîmento, lê em lê dinihêrin ji wê rojê heya îro neko bi bihayê milyaran erebeyek qum anjî torbeyek çîmento li cihekî Asarlıkê nehatiye rijandin. Ev yek jî dide xweyan ku li wê derê gelek nerastî (yolsuzluk) hatine kirin.